

# BÊCÎHKIRÎ Û BÊMILKKIRÎ

MAFÊ RÛNIŞTÎYÊN SÛRÊ YÊ VEGERA MALÊ

AMNESTY INTERNATIONAL

**Rêxistina Efûya Navnetewî tevgereke global a zêdetirî 7 milyon mirovan e ku ji bo dinyayeke ku mafên mirovan ji bo her kesî hebin xebatê dike.**

**Vîzyona me ew e ku her kesek xwedîyê hemû mafan be ku li Daxuyanîya Gerdûnî ya Mafên Mirovan û standardên din ên mafên mirovan ên navnetewî  destnîşankirî ne.**

**Em ji hemû hikûmetan, îdeolojîyên sîyasî, berjewendîyên aborî yan jî dînan serbixwe ne û bi pirayî ji endamên xwe û ji bexişên gel fonan werdigirin.**

© Amnesty International 2016
Ji bilî ku bi awayekî din nehatibe diyarkirin, naveroka vê belgeyê bi lîsanseke “Creative Commons” (atf, ne-bazirganî, ne-pêkhatî, navnetewî 4.0) lîsanskirî ye.
https://creativecommons.org/licenses/by-nc-nd/4.0/legalcode
Ji bo bêtir agahîyê ji kerema xwe biçin rûpela me yê destûran a li websîteya me: www.amnesty.org
Li cîhê ku materyal ji bo xwedîyekî mafê kopîyê yê ji bilî Rêxistina Efûya Navnetewî hatibe raspartin,ev materyal nabe mijara lîsansa Creative Commons.
İYekem car di 2016’an de ji alîyê Rêxistina Efûya Navnetewî (Amnesty International Ltd) ve hatiye weşandin.
Peter Benenson House, 1 Easton Street
London WC1X 0DW, UK

**Pêrist:  EUR 44/5213/2016**
**Zimanê resen: Îngilîzî**

**amnesty.org**

***Wêneyê bergê:*** *Minareya Çarling” û mizgefta dîrokî li navenda Sûrê ku ji pevketinên çekdarî zirar dîtine, li rexê devereke ku ji ber hilweşîna avahîyan vala bûye. © Guy Martin/Panos*

# NAVEROK


**1. KURTE** 5

**2. PAŞXANE** 7

2.1 QANÛN Û STANDARDÊN NAVNETEWÎ YÊN LI SER MAFÊN MIROVÊN KU DI NAV WELÊT DE BÊCÎHKIRÎ 10

2.2 METODOLOJÎ 11

**3. VALAKIRIN Û DERXISTINÊN BI DARÊ ZORÊ JI SÛRÊ** 13

**4. MERCÊN BÊCÎHKIRINÊ** 16

4.1 XANÎ 16

4.2 STANDARDA JÎYANÊ 17

4.3 JIDESTÇÛNA WINDA HÛRMÛRAN 18

4.4 PERWERDE 18

**MALBATÊN SÛRÊ** 20

**5. HÊVÎYÊN VEGERÊ** 25

**6. PÊŞNIYARÊN LI RAYEDARÊN TIRKÎYÊ** 28




© Amnesty International

# 1. KURTE

Di tebaxa 2015'an de, bi hilweşîna pêvajoyeke aştîyê ya nazik a di navbera Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) a çekdar û dewleta Tirk de, agirbesteke du salî bi dawî bû. Ji qonaxên berê yên nakokîya bi dehan salan cudatir, di deh mehên pevketina çekdarî de, ne li deverên bejahîya başûrê rojhilat, lê li bajar û bajarokên herêmê pevketinên çekdarî pêk hatin. Heta niha, bi texmînî 2360 mirov mirine, di nav wan de 368 mirovên sivîl ên neçekdar jî hebûn.[1] Muhtemel e ku qet nebe nîv milyon mirov ji ber tundûtûjîyê, rûxandina milkan a berfireh û qedexeyên derketina derve yên domdar li deverên seranserî başûrê rojhilêt, bi darê zorê ji cîh û warên xwe hatin derxistin. Ev brîfîng balê dikişîne ser bêcîhkirina bi zorê ya li dor 24.000 mirovên ji Sûra navçeya navendî ya dîrokî ya Amedê: mercên bêcîhkirina wan, binpêkirinên domdar ên mafên wan, pir berbiçav yê xanîyên têrkir, û li ser îhtîmala kanîna wan a vegera malên xwe yan navçeya ku lê dijîyan, bi belge dike.

Li Sûrê, wek li navçe û bajarokên din ên seranserî herêmê, takekesên girêdayî PKKê xendek kolan, barîkat çikandin û "rêvebirîya xweser" daxuyandin. Wek bersîva vê rakêşîya li dijî qanûn û pergalê, rayedarên Tirk rêzeyek qedexeyên derketina derve yên 24 seetan û dem nedîyar bi cîh kirin, qedexeyeke mayînde û hîn jî domdar di 11 Çileyê Pêşîn 2015'an de giha bandevê. Wek li deverên din ên bin qedexeya derketina derve, operasyonên leşkerî yên ewlekarîyê ku çekên giran bi kar dianîn, bûn sedema hilweşandina berfireh û gelek mirîyan, ku li gora Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîyê kêmtirîn deh rûniştîyên bêçek jî tê de.[2] Ji ber bêrêje bikaranîna hêza kujende û dijwarîyên jîndarmayinê yên di bin qedexeya derketina derve de, pirî caran bêparbûna ji av û elektrîkê jî di nav de, hemû yan jî hema hema hemû 24.000 rûniştîyên şeş taxên Sûrê yên bin qedexeya derve terka malên xwe kirin. Piranîya wan heta îro jî vala ne û di bin qedexeya derve de mane.

Pevketinên çekdarî di Adarê de li Sûrê bi dawî bûn û di Hezîrana 2016'an de, pevketinên dawî yên çekdarî li herêmên din ên bin qedexeya derketina derve gihîştin encamê. Ji wê demê ve pevketinên çekdarî dom kiriye, lê niha bi piranî li derveyî navendên bajaran pêk tên. Pêşveçûnên li başûrê rojhilêt bi giranî di bin tesîra bersîvên rayedarên Tirk ên piştî hewldana tund a derba leşkerî ya 15ê Tîrmehê teşe girtin. Wek beşekî êrîşa sîstematîk û berfirehtir a li dijî dijberan a di bin rewşa awarte ya hema piştî derbê daxuyandî de, rayedaran berê xwe dan dengên dijber ên Kurd, weşanên medyayê bi tevayî girtin, rojnamevan xistin girtîgehan, rayedarên hilbijartî yên seranserî herêmê rakirin û rêvebirên ji alîyê hikûmetê ve tayînkirî xistin şûna wan, û sazîyên sîvîl ên civakî bi girseyî girtin. Şaredarên Sûr û Bajarê Mezin ê Amedê, aktorên serekî yên ku piştevanîya malbatên li bajêr bêcîhkirî dikirin, bi qayûmên tayînkirî hatin guherandin û sazîyên nedewletî ku alîkarîya yekser a mirovî û alîkarîyên din pêşkêş dikirin, hatin girtin.

Di nav vê bergehê de, mafên malbatên ji malên xwe derxistî û bêmilkkirî hatin piştguhkirin. Piranîya mezin a rûniştîyên ji devera serekî ya Sûrê hîn jî bi darê zorê bêcîhkirî ne. Li gel alîkarîya girîng, lê ne bi têrê û ji asta alîkarîya gerdûnî gelekî kêmtir a rayedaran, gelek malbatên bêcîhkirî nikanîbûne xanîyên alternatîv bi dest bixin. Ji bo mafên din ên wek perwerdeyê bi awayekî têrkir rêz nehatiye girtin. Her wisa, mafên kesên bêcîhkirî yên vegera malên xwe yan devera ku hînî jîyana lê bûne, bi qedexeyên derve yên domdar, binesazî û malên zirardîtî yan rûxandî û domandina hilweşandina xanîyan, xuya dike ku di xetereke giran de ye. Qet nebe %60'ê tevahîya navçeya Sûrê ji alîyê hikûmetê ve hatiye desteserkirin, da ku rê li ber projeyeke

[1] Binêrin, Koma Krîza Navnetewî, *Nakokîya Tirkîyê ya bi PKK re: berdêl zêde dibe. Hejmar di 18 Mijdar 2016an de hatin rojanekirin. Li vir peyde dibe* *http://www.crisisgroup.be/interactives/Tirkîye/*

[2] Binêrin, Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîye, Qedexeyên Derve di navbera *16 Tebax 2015-16 Tebax 2016'an de û Sîvîlên Kuştî, Şaneka Agahîyê,* 21 Tebax 2016. Li vir peyde dibe http://tihv.org.tr/16-agustos-2015-16-agustos-2016-tarihleri-arasinda-sokaga-cikma-yasaklari-ve-yasamini-yitiren-siviller-bilgi-notu/

nedaxuyandî ya rejenerasyona bajarî veke, ku bêyî şêwirdarîya li gel rûniştîyên tesîrlêbûyî ya pêwîst tê pêşvexistin û pêş dibîne ku rûniştîyên Sûrê ji bo deverên ji Sûrê gelekî dûr bên transferkirin.

Pêvajoya niha ya bi tevayî li seranserî herêmê, wê ramanê dide ku pîlaneke ji berê de sazkirî heye ku rûniştîyan bêcîh bike, deveran hilweşîne û ji nuh de ava bike, da ku ewlekarîyê bi guhertinên binesazîyê û transferên nifûsê bi cîh bike. Ji bo çareserkirina vê krîza mezin, divê rayedar bi awayekî acîl ji bo rûniştîyên Sûrê û ji bo tevahîya bi sed hezaran mirovên ji deverên bin qedexeya derketina derve yên seranserî herêmê bêcîhkirî pîlaneke berbiçav saz bikin. Pîlaneke wiha ya ku bi şêwirdarîya giştî bi rûniştîyên tesîrlêbûyî re pêk hatî divê bi lezgînî were pêşdexistin û pir girîng e ku erka dewletê bi cîh bike ku ji bo ku kesên bêcîhkirî bi dilxwazî vegerin malên xwe, nebû vegerin devera ku hînî jîyana lê bûne, mercan pêk bîne û îmkanan pêşkêş bike.



*"Minareya Çarling" û mizgefta dîrokî li navenda Sûrê ku ji pevketinên çekdarî zirar dîtine. © Guy Martin/Panos*


*Devera navenda Sûrê ku avahîyan ji pevketinên çekdarî zirar dîtine yan jî hatine hilweşandin. © Guy Martin/Panos*

# 2. PAŞXANE

Sûr navçeya navendî û dîrokî ya Amedê (Diyarbekir) ye, û Amed jî bajarê herî mezin li başûrê rojhilatê Tirkîyê ye, ku bi piranîyeke mezin Kurd lê dijîn. Ji serdemên Helenîk û vir ve navendeke girîng bûye; bedenên wê yên dêrîn ên asêkirî û Baxçeyên Hewselê yên bi ser ve keleporgeheke cîhanî ya UNESCO pêk tînin.[3] Di nav mizgeft, dêr û kinîşteyên (sînagog) dîrokî yên Sûrê de avahîyên nûjen jî hene, ku pir ji wan di 1980-1990'an de dema ku malbat di asta bilind a nakokîya navbera Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) ya çekdar û hêzên ewlekarîyê yên Tirkîyê de, ji herêmên bejahîya başûrê rojhilatê Tirkîyê revîyan, bi lez û bez hatin avakirin. Nakokî û bi darê zorê valakirina gundên başûrê rojhilat ji alîyê hêzên ewlekarîyê yên Tirkîyê ve, nifûsa Amedê bêtirî du qatan zêde kir, niha hema hema 1 milyon e. Gelek ji kesên bêcîhkirî yên nav welêt ku hatin Amedê malên xwe li Sûrê çêkirin. Îro nifûsa bêcîhkirîyên nav welêt ên Sûrê yên ji başûrê rojhilêt û malbatên ji Amedê civakekê pêk tînin ku yek ji navendên herî xizan ên Amedê ye û Amed bi xwe jî li navenda başûrê rojhilatê Tirkîyê ye ku herêma herî xizan a Tirkîyê ye.[4] Li seranserî welêt bêcîhkirî yên ji gundên başûrê rojhilat hîn jî di nav êşa pirsgirêkên întegrasyonê, xanîyên xerab û xizanîyê de ne. Kêm ji wan vegerîyane gundên xwe.[5]

Di Tîrmeha 2015'an de, pêvajoyeke şikestokî ya aştîya di navbera PKK û dewleta Tirkîyê de têk çû. Piştî bidawîbûna agirbestê û du salên aştîya relatîv, Amed û başûrê rojhilêt dîsa bû qada tundûtûjîyê, PKK û hêzên dewletê bi çekan pev ketin, bûn sedema mirîyan, ku li gora texmîneke Koma Krîza Navnetewî, kêmtirîn 2360 mirov û ji wan jî kêmtirîn 368 rûniştîyên bêçek bûn.[6]. Ji dewra asta herî bilind a nakokîyê ya 1990an cudatir, ku şer li çîyan û cîhên xewle yên başûrê rojhilêt çêdibûn, ji 2015'an û pey ve pevketinên çekdarî gelekî bêtir li herêmên bi nifûsa zêde yên bajarên seranserî başûrê rojhilêt pêk hatin. Li Sûrê, her wiha li hin deverên bajarên din ên seranserî herêmê, kesên çekdar ên girêdayî PKKê di kuçeyên wê yên teng de barîkat çêkirin û xendek kolan; û hêzên ewlekarîyê yên dewletê ji bo ku kontrolê dîsa bi dest bixin, hêzeke kujende bi kar anî. Di Îlona 2015'an de, rayedaran dest bi bicîhkirina qedexeya derketinê ya şev û rojê, qedexeyeke giştî ya ji malê derketinê ji bo rûniştîyan kir; ev yek pir caran bi mehan bênavber hat pêkanîn, û av, elektrîk û car caran torên telefonên destan û sînyalên înternetê yên 3G li gelê wê herêmê hatin qutkirin. Di hin rewşan de, dijwar an jî ne mimkun bû ku rûniştî xwarinê û tew lênêrîna tibî ya acil jî bi dest bixin.[7] Rayedar îdia dikin ku qutkirinên av û elektrîkê ji ber zirara li binesazîyê ya ji ber pevketinên çekdarî pêk dihatin; lê rûniştîyan îdia kir ku rayedaran bi zaneyî xizmet qut kirin. Polîsekî li Sûrê peywîrdar ku ji Rêxistina Efûya Navnetewî re axivî îdiayên rûniştîyan erê kir; got ku wan bi meqsed av û elektrîk qut kirine ku kesên çekdar ên ku şerê rayedaran dikir, bêmoral bikin.[8]

Rêxistina Efûya Navnetewî dibîne ku rayedarên Tirk ji ber barîkatên seranserê herêmên bajarên başûrê rojhilêt li gel daxuyanîyên birêvebirîya xweser, bi xetereke yekcar dijwar û cidî ya ewlekarîyê re rû bi rû bûbûn. A rastî, ji bo parastina mafê her kesî yê jîyan û ewlehîya wan erkeke wan hebû ku qanûn û pergalê bi cîh bikin. Lê belê bergirîyên ewlekarîyê çi qas pêwîst bin jî, divê mafên mirovan binpê nekin. Nirxandina Rêxistina Efûya Navnetewî ew e ku rayedaran bergirîyên wek qedexeya derketina derve ya dema dirêj û nedîyar, zêde bikaranîna hêza pirê caran kujende, jicîhûwarkirina bi darê zorê û bisînorkirinên wiha bi kar

[3] Binêrin, UNESCO, Bergeha Çandî ya Keleya Amedê û Baxçeyên Hewselê. Li vir peyde dibe http://whc.unesco.org/en/list/1488
[4] Binêrin, Sazîya Statîstîkê ya Tirk, Encamên Lêkolîna Mercên Dahat û Jîyanê, 2015. Li vir peyde dibe http://www.turkstat.gov.tr/PreHaberBultenleri.do?id=21868
[5] Binêrin, Navenda Çavdêrîya Bêcîhkirinê ya Navnetewî, Tirkîye: Bêcîhkirina nav welêt bi kurtî, Çileyê Pêşîn 2013. Li vir peyde dibe http://www.internal-displacement.org/europe-the-caucasus-and-central-asia/Tirkîye/summary/
[6] Binêrin, Koma Krîzê ya Navnetewî, *Nakokîya Tirkîyê ya bi PKK re: berdêl zêde dibe.* Hejmar di 18 Mijdar 2016'an de hatin rojanekirin. Li vir peyde dibe http://www.crisisgroup.be/interactives/Tirkîye/
[7] Binêrin, Rêxistina Efûya Navnetewî, Operasyonên îstîsmarîya qedexeyên derve yên dem nedîyar bi dawî bikin. 21 Çileyê Paşîn 2016. Li vir peyde dibe https://www.amnesty.org/en/documents/eur44/3230/2016/en/
[8] Gotûbêja li Sûrê, Hezîran 2016

anîn ku bêrêje bûn, mafên mirovan binpê dikirin û di hin mînakan de jî dibûn wek cezakirina kolektîv.[9] Di Hezîrana 2016'an de, Komîsyona Venedîkê ya Konseya Ewropayê gihîşt wê encamê ku biryarên qedexeya derketina derve yên rayedarên Tirk pêwîstîyên hiqûqa di qanûna bingehîn a Tirkîyê û Konvensîyona Ewropayê ya Mafên Mirovan de ravekirî bi cîh neanîne. Wê sazîyê pêşniyar kir ku rayedarên Tirk daxuyanîyên qedexeya derketina derve li gora Qanûna Birêvebirina Deverî bi dawî bîne û teqez bike ku hemû bergirîyên acil ên ku xistine meriyetê li gor hiqûqa netewî ya Tirkîyê û pêdivîyên hiqûqî yên navnetewî bin û  çarçoveya hiqûqî ya ji bo daxuyanîyên wiha bê pêşçavkirin.[10]

Di dema qedexeyên derketina derve de, rayedaran operasyonên polîsî û leşkerî pêk anîn û ew û takekesên çekdar ên girêdayî PKKê pev ketin, tank û çekên din ên giran bi kar anîn. Di nav mexdûrên van operasyonên ewlekarîyê de rûniştîyên bêçek ên reşexelk jî hebûn. Agahîyên ku ji alîyê Sazîya Mafê Mirovan a Tirkîyê ve hatine komkirin li herêmên qedexeya derve, di navbera Tebaxa 2015'an û Tebaxa 2016'an de 321 mirinên rûniştîyên bêçek qeyd kirine, ku di nav wan de 79 zarok jî hebûne. Deh ji wan mirinan, sê zarok jî di nav de, li Sûrê hatin qeydkirin.[11] Rayedaran ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku li Sûrê termên 65 takekesên çekdar derxistine û 68 kes binçav kirine.[12] Her çend kêmasîya lêpirsînên karîger hebin û gotinên bi nakokî rewşên gelek mirinan şêlî bikin jî, lêkolîna Rêxistina Efûya Navnetewî a piştî qedexeya derve ya di Îlona 2015'an de li Cizîrê raber kir ku hêzên ewlekarîyê di bikaranîna çekan a li herêmên qedexeya derve de bêxem bûne û operasyon bi mebesta kuştina takekesên çekdar hatine pêkanîn, ne ji bo binçavkirina wan.[13] Di nav yên li herêmên bin qedexeya derve kuştî de zarokên piçûk, kal û pîrên ku îhtîmala tevlêbûna wan a pevketinên çekdaran pir kêm bû jî hebûn.

Li Sûrê, li pey pardemeke ku qedexeya derketina derve ji xwe ew neh rojbûn  kû xistibûn meriyetê, di 11 Çileyê Pêşîn 2015'an de, li şeş ji 15 taxên navçeyê, devereke bi ser hev de xwedî nifûseke 24.000 rûniştîyan, qedexeyeke derketina derve ya dem nedîyar hat daxuyanîkirin.[14] Li dema ku operasyonên hêzên ewlekarîyê û pevketinên çekdarî bi dawî bûn, li gor agahîya ku Parêzgerîya Amedê di 9 Adar 2016'an de da Rêxistina Efûya Navnetewî , 65 leşker û polîs û 65 takekesên çekdar ên girêdayî PKKê  hatin kuştin û termên wan hatin rakirin.[15] Dîsa jî di gel ku pevketinên çekdarî û operasyonên leşkerî di serê Adara 2016'an de li herêmê bi dawî hatin jî, li piranîya vê herêmê hîn jî qedexeya derketina derve li kar e. Li gel şeş taxên ku li beşine wan hema hema ev salek e qedexeya derketina derve heye, li hinek taxên din ên Sûrê jî qedexeya derketina derve ji bo dewrên kurtir pêk hat.

Wek li Sûrê, li her bajarekî ku qedexeya derketina derve bi şev û roj hat pêkanîn, bikaranîna çekên giran a berî û piştî operasyonên hêzên ewlekarîyê û rûxandina mezin a binesazî û avahîyan a ji alîyê hêzên ewlekarîyê  li gel bêcîhkirina bi darê zorê ya hema hema tevaya nifûsê pêk hat. Piştî rawestana pevketinên li Sûrê, hema hema hemû milk hatin desteserkirin û gelek avahî ji xwe berê hatibûn hilweşandin -bi nêrîneke ji nuh de avakirina navçeyê. Biryarên "desteserkirina acil" ên hikûmetê li herêmên din jî hatibûn dayin, ku Cizîr, Silopya û Gever jî di nav de bûn; armanca raberkirî ew bû ku wê rawestgehên kontrolê li nav herêmên ku berê li wan qedexeya derve hebû, bihatina avakirin.[16] Dereca desteserkirina li van herêman ne bi qasî ya Sûrê be jî berfireh e. Wek mînak, li bajarê Cizîrê, bi tevayî 22 parsel xak li sê taxan hat desteserkirin.[17] Li deverên din ên wek Nisêbîn û Şirnexê, piştî bidawîbûna pevketinên çekdaran, bêyî ku fermanên "desteserkirina acil" bên dayin, avahî bi berfirehî hatin hilweşandin. Pêvajoya bi tevayî ya li seranserî herêmê pîlaneke berê sêwirandî ya bêcîhkirina rûniştîyan, hilweşandin û ji nuh ve avakirina deveran tîne hişê mirov, da ku bi guhertinên binesazî û guhastina rûniştîyan ewlekarîyê bi cîh bike. Pêşî li vegera van deveran hatiye girtin, çi bi qedexeyên derve yên domdar çi jî bi dereceya mezin zirara li avadanî û binesazîyê.

---

[9] Binêrin, Rêxistina Efûya Navnetewî, *Operasyonên îstîsmarîya qedexeyên derve yên dem nedîyar bi dawî bikin.* 21 Hezîran 2016. Li vir peyde dibe https://www.amnesty.org/en/documents/eur44/3230/2016/en/

[10] Binêrin, Komîsyona Venedîkê, *Tirkîye – Nêrîna li ser Çarçoveya Hiqûqî  ya ku qedexeyên derve bi rê ve dibe, ji alîyê Komîsyona Venedîkê ve, di Dahnê Giştî yê 107an de (Venedîk, 10-11 Hezîran 2016).* Li vir peyde dibe http://www.Venedîk.coe.int/webforms/documents/?pdf=CDL-AD(2016)010-e

[11] Binêrin, Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîye, Qedexeyên Derve di navbera *16 Tebax 2015-16 Tebax 2016an de û Sîvîlên Kuştî,  Şaneka Agahîyê,* 21 Tebax 2016. Li vir peyde dibe http://tihv.org.tr/16-agustos-2015-16-agustos-2016-tarihleri-arasinda-sokaga-cikma-yasaklari-ve-yasamini-yitiren-siviller-bilgi-notu/

[12] Hevpeyvîn bi Dozgerîya Amedê re, Gulan 2016.

[13] Binêrin, Rêxistina Efûya Navnetewî, *Operasyonên îstîsmarîya qedexeyên derve yên dem nedîyar bi dawî bikin.* 21 Hezîran 2016. Li vir peyde dibe https://www.amnesty.org/en/documents/eur44/3230/2016/en/

[14] Binêrin, daxuyanîya qedexeya derve ji alîyê Parêzgerîya Amedê ve http://www.diyarbakir.gov.tr/11122015-basin-duyurusu-Sûrda-sokaga-cikma-yasagi?_sm_au_=iVVlNVl4mjjFFJV2

[15] Civîna Rêxistina Efûya Navnetewîbi Parêzgerê Amedê re, 20 Gulan 2016.

[16] Binêrin, BBC Tirkî *Biryarên nuh ên desteserkirinê li Amed, Colemêrg û Şirnexê.* 11 Nisan 2016. Li vir peyde dibe http://www.bbc.com/turkce/multimedya/2016/04/160411_kalekol_kamulastirma. Biryarên Desteserkirinên Rewşa Acil li gora Xala 27an a Qanûna Desteserkirinê ya 1983an, hejmar 2942 tên dayin, ku dihêle ku rayedar heft rojan piştî ku biryar hatiye dayin, milkên desteserkirî bi kar bînin.

[17] Binêrin, Evrensel, Li 7 *navçeyên din jî 'desteserkirina bi lezgînî' yê pêk were*, 11 Nisan 2016. Li vir peyde dibe https://www.evrensel.net/haber/277295/7-ilcede-daha-acele-kamulastirma-yapilacak

Di rewşa Sûrê de, projeyeke rejenerasyona bajarvanîyê ya pîlankirî lê zêdeti pêknehatî bi tarîxa 2012'an, ku pêşdîtinîya transferên rûniştîyên navçeyê dikir, hatiye vejîyandin.[18] Ji ber nebûna agahîyên bi hûrgilî yên ji gel re vekirî ya ji alîyê rayedaran pêşkêşkirî û nebûna şêwirdarîyên bi rûniştîyên bêcîhkirî re, ne zelal e ka proje wê çawa bê guherandin û wê ji bo kanîna vegera malê ya rûniştîyên taxên Sûrê were çi wateyê. Her çend rayedaran pir caran soz dabin ku wê li gel xanîyan razemenî û ve-avakirina binesazîyê jî bikin, pirsnîşanên mezin ên derbarê kanîna vegera ser mal û jîngehên xwe hebûna xwe didomînin.[19] Her çend hejmara mirovên bêcîhkirî ji deverên seranserî herêmê yên qedexeya derve lê bicîhkirî nayê zanîn jî, bê guman bi sedhezaran e û pir mimkun e ku ji nîv milyonî bêtir be. Ev rapor balê dide ser kesên di nav welêt de bêcîhkirî ku ji Sûra Amedê hatine derxistin. Bi gelek awayan, pirsgirêkên ku rû bi rû dibin ji alîyê kesên bêcîhkirî yên ji seranserî herêmê ve jî tên parvekirin. Lê belê, di rewşên din de, îhtîmal heye ku kesên ku ji deverên qedexeya derve li tevaya bajêr bicîhkirî hatine derxistin, bêtir jî ketibin bin tesîrê; îmkana li cem merivên xwe mayinê kêmtir e û pirsgirêkên bidestxistina perwerde û xizmetên bingehîn mezintir in.

Hejmara mirovên ji Sûrê derxistî ji alîyê rayedarên şaredarîyê ve wek 40.000 tê texmînkirin.[20] Qedexeya derketina derve bi tevayî kêmtirînli 35 navçeyên seranserî rojhilat û başûrê rojhilatê Tirkîyê hat lidarxistin. Di nav van de bi awayekî berbiçav bajarê Cizîrê yê bi nifûsa 120.000an a berî qedexeya derketina derve ya 79 rojan, Silopya 19 rojan û Nisêbîn, Şirnex û Gever, her yek bi nifûsa 100.000an a berî qedexeya derketina derve, ku teva ku pevketinên li wir bêtirî şeş meh berê bi dawî bûne jî, qedexe li tevayî yan beşine van bajaran ji 14 Adar 2016'an û vir ve hîn jî didome. Hîn di Sibata 2016'an de, berî daxuyanîya qedexeya derve ya li Nisêbîn, Şirnex û Geverê, Wezareta Tendirustîyê ragihand ku li Cizîr, Silopya û deverên din ên başûrê rojhilatê Tirkîyê ku operasyonên ewlekarîyê lê hatine pêkanîn, kêmtirîn 355.000 mirovên bêcîhkirî hebûn.[21] Ji vê demê û pê de hejmarên rojanekirî ji alîyê rayedaran ve nehatine dayin, lê li gor berfirehîya qedexeyên derketina derve yên daxuyandî, hejmara tevayî ya bêcîhkirîyên seranserî herêmê yên li deverên qedexeya derketina derve çêbûyî, pir muhtemel e ku ji nîv milyon mirovan bêtir bûbe.

## TARÎXÊN SEREKÎ

Tîrmeh 2015: Agirbesta navbera PKKê û dewleta Tirk têk diçe û dijminatî dîsa dest pê dikin.

6 Îlon 2015: Qedexeya derketina derve ya yekem li Sûrê daxuyandî.

11 Çileyê Pêşîn 2015: Li 6 ji 15 taxên Sûrê qedexeyeke derketina derve ya dem nediyar tê daxuyandin. Pevketinên çekdarî yên navbera takekesên girêdayî PKKê û hêzên dewletê tund dibin. Gelek rûniştîyên Sûrê terk dikin.

9 Adar 2016: Rayedar daxuyanî didin ku operasyona leşkerî li Sûrê bi dawî hatiye. Pevketinên çekdarî qedîyane, lê qedexeya derketina derve hîn li meriyetê ye.

21 Adar 2016: Hikûmet biryara "desteserîya acil" a piranîya erdê Sûrê dide. Xwedîtîya erd derbasî Wezareta Pîlansazîya Hawirdor û Bajarvanîyê dibe.

4 Îlon 2016: Serokwezîr Binali Yıldırım daxuyanîya pîlana razemenî û ve-avakirina herêmê ji bo rojhilat û başûrê rojhilatê Tirkîyê dide, ku tê de 7,000 avahîyên nû yên li Sûrê jî heye. Daxuyanî qet qala şêwirdarîya bi rûniştîyan re nake. Vegera Sûrê ji bo rûniştîyên bêcîhkirî hîn jî muhtemel xuya nake.

[18] Binêrin, *Wezareta Plansazîya Hawirdor û Bajarvanîyê, Vegunerîna Bajarî û Amed.* Sibat 2015. Li vir peyde dibe http://www.csb.gov.tr/db/diyarbakir/editordosya/1.pdf
[19] Ji bo planên hikûmetê, binêrin, danezana Serokwezîr di dema serdana herêmê de ku sazîya nûçeyên dewletê rapor kiriye. Anadolu Ajansi, *Serokwezîrê Tirk pakêta rojhilatê Tirkîyê dîyar kir,* 4 Îlon 2016. Li vir peyde dibe http://aa.com.tr/en/politics/turkish-pm-reveals-economic-package-for-eastern-Tirkîye/640803 . Binêrin, her wiha danezana Wezîrê Hawirdor û Bajarvanîyê, *Wezîrê Hawirdor û Bajarvanîyê rave kir! 7 hezar lîra meaş dane...* 7 Îlon 2016. Li vir peyde dibe http://www.milliyet.com.tr/bakan-acikladi-7-bin-lira-maas-siyaset-2323180/
[18]Hevpeyvîn bi Şaredarîya Sûrê re, Gulan 2016.
[21] Binêrin, T24, Ji ber operasonên li Başûrê Rojhilêt 355 hezar kesan koç kir, 28 Sibat 2016. Li vir peyde dibe http://t24.com.tr/haber/guneydogudaki-operasyonlar-yuzunden-355-bin-kisi-goc-etti,329927

# 2.1 QANÛN Û STANDARDÊN NAVNETEWÎ YÊN LI SER MAFÊN MIROVÊN KU DI NAV WELÊT DE BÊCÎHKIRÎ

Konvensîyonên qanûna mafên mirovan ên navnetewî ku Tirkîye jî tev lê bûye, ji bo mafên mirovên di nav welêt de bêcîhkirî parastinan dihewîne. Mirovên bêcîhkirî jî wek her kesê din ê di nav welêt de xwedî heman mafên sîvîl, çandî, aborî, polîtîk û civakî ne û ji ber statuya wan divê li dijî wan cudagirtin pêk neyê.[22] Ji vê wêdetir jî, li dijî bêcîhkirina nav welêt a bi darê zorê parastinên xurt hene. Peymana Navnetewî ya ji bo Mafên Sîvîl û Sîyasî (PNMSS) ku Tirkîyê jî îmze kiriye, azadîya tevgerê garantî dike (Xal 12), ku parastina li dijî hemû awayên bêcîhkirina nav welêt a bi darê zorê jî dikeve nav.[23] Hemû sînorkirinên vî mafî divê li gor qanûnê bin û tenê di hin rewşên awarte yên hejmareke bisînor de dikarin mafdar bên dîtin: ji bo parastina ewlekarîya netewî, pergala gel, tendirustîya gel an jî maf û azadîyên kesên din pêwîst bin.[24] Sînorkirin divê her wiha bi hemû mafên din ên Peymanê re hevgirtî bin.[25]

Xala 17'an a Peymanê mafê azadîyê ji desttêwerdana kêfî yan jî neqanûnî ya mehremî, malbat, mal an danûstandinê jî diparêze.[26] Komîteya Mafên Mirovan zelal kiriye ku parastina ji desttêwerdana kêfî kane wiha bê berfirehkirin ku desttêwerdana li gora qanûnê jî bihewîne û ku hemû desttêwerdanên wiha divê li gora provîzyon, armanc û hedefên Peymanê bin û di her rewşê de, di mercên taybetî de beraqil bin.[27]

Tirkîye her wiha beşdarekî Konvensîyona Ewropayê ya Mafê Mirovan e jî. Wek PNMSS, di Xal 8 a Konvensîyonê de jî, parastineke mafên malbatî û mehremîyê heye, desttêwerdan dîsa bi awartebûnên tund ên firehîyeke bisînor ve tê girêdan.[28] Dadgeha Ewropayê ya Mafên Mirovan di doza valakirin û bêcîhkirinên berê yên li Tirkîyê de binpêkirina Xala 8'an dîyar kiriye.[29]

Valakirinên bi darê zorê her wiha li gora Xala 11'an a Peymanê ya li ser Mafên Aborî, Civakî û Çandî jî hatine qedexekirin, ku mafê xanîyên têrkir diparêze. Xanîyên têrkir ji alîyê Komîteya li ser Mafên Civakî, Aborî û Çandî ve hatine ravekirin; sazîya pispor pêwîst dike ku Peyman wek ku pîvanên ewlehîya hiqûqî ya xwedîtî û bikaranîna milk jî bide ber xwe were şîrovekirin; parastinên li dijî valakirina bi darê zorê, peydebûna xizmetan, li gora budçeyê bûyin, jîyanbarî, gihanbarî, têrkirina cîh û çandê di nav de ne.[30] Valakirinên bi darê zorê, dema ku hejmarek parastinên prosedurî nayên bicîhkirin pêk tên; şêwirdarîya ji dil, hişyarîya têrkir û pêşkêşkirina cîhê lêmayinê yê têrkir ji bo kesên hewce di nav de ne.[31] Hukmên ên têkilîdar ên PNMSS ji bo Bêcîhkirîyên Nav Welêt û ji bo kesên ku di bin qedexeya derve ya şev û rojê de dijîn, mafê avê, paqijîyê, standarda jîyanê, tendirustî û perwerdeyê dihewîne.[32]

Dadgeha Ewropayê ya Mafên Mirovan biryar daye ku hilweşandina kêfî ya xanîyan kane qedexeya muameleya nemirovî binpê bike (DEMM, Xal 3).[33]

Prensîpên Rêberîyê yên Netewên Yekbûyî yên li ser Bêcîhkirina bi Darê Zorê di 1992'an de ji alîyê Nûnerên Taybetî yên NY ve ji bo kesên di nav welêt de bêcîhkirî, bi bingeha standardên heyî yên navnetewî ji bo pêwîstîyên taybetî yên kesên di nav welêt de bêcîhkirî, hatin pêşdexistin.[34] Prensîp pêwîst dikin ku kes rû bi

---

[22] Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY. Li vir peyde dibe https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/G98/104/93/PDF/G9810493.pdf?OpenElement

[23] Komîteya Mafên Mirovan a NY (KMM), *CCPR Şîroveya Gelemperî No. 27: Xal 12 (Azadîya Tevgerê)*, 2 Mijdar 1999, CCPR/C/21/Rev.1/Add.9, para 7. Li vir peyde dibe: http://www.refworld.org/docid/45139c394.html

[24] Komîteya Mafên Mirovan a NY (KMM), *CCPR Şîroveya Gelemperî,No. 27: Xal 12 (Azadîya Tevgerê)*, 2 Mijdar 1999, CCPR/C/21/Rev.1/Add.9, para 2. Li vir peyde dibe: http://www.refworld.org/docid/45139c394.html

[25] Peymana Navnetewî ya Mafên Sîvîl û Sîyasî, UNTS, vol. 999, p. 171, Art. 12(3). Binêrin, her wiha Komîteya Mafên Mirovan a NY (KMM), *CCPR Şîroveya Gelemperî No. 27: Xal 12 (Azadîya Tevgerê)*, 2 Mijdar 1999, CCPR/C/21/Rev.1/Add.9, para 11. Li vir peyde dibe: http://www.refworld.org/docid/45139c394.html

[26] Xal 17 wiha dibêje: '(1) Divê kesek li ser mahremî, malbat, mal an danûstandinên xwe rû bi rûyî desttêwerdanan nebe, ne jî êrîşên neqanûnî li şeref û navê wan bibin. (2) Mafê her kesî heye ku qanûn wan ji desttêwerdan an êrîşên wiha biparêze.'

[27] Komîteya Mafên Mirovan a NY (KMM), *CCPR Şîroveya Gelemperî No. 16: Xal 17 (Mafê Mahremîyê), Mafê Rêzgirtina Mahremîyê, Malbatê, Malê û Peyamnêrîyê û Parastina Şeref û Nav*, 8 Nîsan 1988, para 4. Li vir peyde dibe: http://www.refworld.org/docid/453883f922.html

[28] Xal 8(2) wiha dibêje: 'Ji bilî rewşa ku li gora qanûnê be û li civakeke demokratîk ji bo berjewendîyên ewlekarîya netewî, ewlehîya gel an xweşîya aborîya welêt pêwîst be, ji bo pêşîlêgirtina sûc, ji bo parastina tendirustî û moralê, an ji bo parastina maf û azadîyên kesên din pêwîst be, divê rayedarîya dewletê tu carî desttêwerdana vî mafî nekin'

[29] Binêrin, wek mînak ECtHR. Doğan û yên din li dijî Tirkîyê, 29 hezîran 2004, paras 157-160.

[30] Komîteya NY ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî (KMACÇ), *Şîroveya Gelemperî, No. 4: Mafê Xanîyê Têrkir (Xal 11 (1)a peyamê)*, 13 Çileyê Pêşîn 1991, E/1992/23, para 8

[31] Komîteya NY ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî (KMACÇ), *Şîroveya Gelemperî No. 7: mafê xanîyê têrkir (Art.11.1): jêderxistinên bi darê zorê*, 20 Gulan 1997, E/1998/22, para 15. Li vir peyde dibe: http://www.refworld.org/docid/47a70799d.html

[32] *Peymana Navnetewî ya Mafên Sîvîl û Sîyasî PNMSS*, UNTS, vol. 993, p. 3, Xal 11, 12 û 13.

[33] ECtHR. *Selcuk û Aşker v Tirkîye*, 24 Nîsan 1998, para. 38.

[34] Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY. Li vir peyde dibe https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/G98/104/93/PDF/G9810493.pdf?OpenElement

rûyî bêcîhkirina kêfî nebin, û ku her bêcîhkirinek divê ji pêwîstîya rewşan dirêjtir dom neke (Prensîp 6). Ew pêwîst dikin ku rayedar bi cîh bikin ku ji bo kesên bêcîhkirî cîhên mayinê bên pêşkêşkirin û teqez bikin ku standarda jîyana kesên bêcîhkirî têrkir be (Prensîp 18). Prensîp dibêjin ku divê kesek bi awayekî kêfî ji milk û malên xwe neyê dûrxistin û ku ewên ku li dû xwe dihêlin ji rûxandin, desteserkirina kêfî û neqanûnî, lêrûniştin û bikaranînê werin parastin (Prensîp 21). Mafê kesên bêcîhkirî yê perwerdeyê heye. Divê rayedar tevlêbûna giştî ya jin û keçan bi wekhevî li bernameyên perwerdeyî dabîn bikin (Prensîp 23). A herî girîng, erk û berpirsîyeke sereke ya dewletan heye ku şert û mercan saz bike û her wiha îmkanan pêşkêş bike da ku kesên di nav welêt de bêcîhkirî bi dilxwazi, ewlehî û serbilindî vegerin, mal an cîhên ku lê diman an jî bi dilxwazî li beşekî din ê welêt bi cîh bibin. Divê dewlet di nav hewldanên taybetî de bin ku kesên di nav welêt de bêcîhkirî bi giştî tev li pîlansazî û rêvebirîya veger, bicîhbûn û reîntegrasyona wan bibin. (Prensîp 28) Divê dewlet alî kesên bêcîhkirî bike ku mal û milkên xwe bi dest bixin û dema ku bidestxistin ne mimkun be jî, teqez bike ku qerebûyê (tezmînat) bistînin (Prensîp 29).

Prensîp û Rêberîyên Bingehîn ên NY ji bo avadanîyê, li ser valakirin û bêcîhkirinê, li gor qanûna mafên mirovan a navnetewî jî, li ser tuwancên mafên mirovan ên valakirinên bi avadanîyê ve têkilîdar û bêcîhkirina eleqedar radiweste.[35]

Di 22 Tîrmeh 2016'an de, piştî hewldana derba 15'ê Tîrmehê ku bi darê zorê hikûmeta hilbijartî ya Tirkîyê bixîne, hikûmetê li seranserî welêt rewşa awarte daxuyanî kir. Di 3'ê Cotmehê de sê mehên din li dewra sê mehî ya pêşîn hat zêdekirin. Her çend hin mafên di PNMSS û DEMF de, wek azadîya tevgerê, di dema rewşa awarte ya fermî daxuyanîkirî de ku gefan li jîyana netewe dixwin, kêm dibin jî, erka rayedaran a rêzgirtin û parastina van mafan didome, û divê bicîh bikin ku hemû pêşgirîyên di rewşa awarte de hatine pêkanîn di rêjeya armanca meşrû ya şopandî de bin û sînorkirinên zêde yên di rewşa awarte de hatine bicîhkirin bi xwezaya xwe demkî bin. Li gora PNMACÇ bi tu awayî xerabkirina rewşê nayê qebûlkirin, divê pêwîstîyên bingehîn ên sosyo-ekonomîk ên mirovan di hemû deman de bên parastin.

Deverên qedexeya derketina derve ku mirov jê bi darê zorê hatin derxistin, cîhên binpêkirinên mafên mirovan ên berfireh û pê re cezanekirina kiryaran bûn. Di rewşa awarte de rewşa mafên mirovan li başûrê rojhilatê Tirkîyê xerabtir jî bû. Di rêzeyek biryarnameyên birêvebirîyê yên di rewşa awarte de daxuyandî de, Hikûmet wek beşekî êrîşa sîstematîk a li ser dengên nerazî li seranserî spektrûma sîyasî, tev gerîya ku hemû dengên muxalefeta Kurd ji holê rake. Medya, sazîyên nedewletî (SN) û nûnerên sîyasî yên ku piştevanîya kesên bêcîhkirî li başûrê rojhilêt dikir jî di nav vê de bûn. Biryarnameyên hikûmetê hemû derçûnên medyaya Kurdî ya netewî ya dijber û gelek ji yên herêmî yên li Amedê û cîhên din ên başûrê rojhilatê Tirkîyê bi mayîndeyî girtin û şaredarên hilbijartî, yên Sûr û Amedê jî di nav de bi qayûmên ji alîyên hikûmetê ve tayînkirî guherandin.[36] Di Mijdarê de, bi sedan sazîyên sivîl li seranserî Tirkîyê berê hatin betalkirin û dûre bi hêncetên nedîyarkirî yên wek"têkilîyên bi rêxistinên terorîst re an jî xetereya ji bo ewlekarîya netewî" bi mayîndeyî hatin girtin.[37] Di nav sazîyên sivîl yên girtî de yên ku ji bo malbatên ji Sûrê derxistî alîkarîya yekser dikir jî hebûn. Ev pêşveçûn û xerabbûna gelemperî ya mafên mirovan li seranserî welêt di rewşa awarte de, dikin ku îhtîmala ku kesên bêcîhkirî mafên xwe bi dest bixin û bi kar bînin qelstir jî be.

# 2.2 METODOLOJÎ

Ev kurteya ku balê dide ser bêcîhkirina ji Sûra Amedê, li ser lêkolîna li Amedê seranserî 2016'an ava bûye; hevpeyvînên bi 26 malbatên bêcîhkirî, parêzer, çalakvan û sazîyên sivîl, Şaredarîyên Sûr û Amedê û rayedaran re jî di nav de ne. Rêxistina Efûya Navnetewî bi Serdozgerê Amedê û Parêzger re hevdîtin pêk anîn. Agahîya nivîskî ya ku Nivîsgeha Parêzger pêşkêş kir bi taybetî alîkarîya lêkolînê kir û di vê kaxeta kurteyê de tê qalkirin. Rayedaran her wiha di Gulan û Hezîrana 2016an de hişt ku bi awayekî bi sînor em têkevin devera Sûrê ya bin qedexeya derve. Di Hezîranê de, tevî ku qedexeya derve li wir rabûbû jî, bi hêncetên çêkirî ku ji bo ketina bajêr destûra nivîskî pêwîst e, nehiştin ku nûnerên Rêxistina Efûya Navnetewî têkevin Cizîrê. Rêxistina Efûya Navnetewî dikir bi malbatên ku vedigerîyan Cizîrê û malbatên ji Şirnexê derxistî û li gundên derdorê mayî re hevpeyvîn pêk bianîna. Rêxistina Efûya Navnetewî daxwaz kir ku di

[35] Prensîp û Rêberîyên Serekî yên NY li ser valakirin û bêcîhkirinên ji ber avadanîyê, Pêvek 1 a rapora Raportorê Taybet ê xanîyê têrkir wek hêmanekî mafê standardeke jîyanê ya têrkir. Li vir peyde dibe http://www.ohchr.org/Documents/Issues/Housing/Guidelines_en.pdf?_sm_au_=iVVF1500P7DHLL3F
[36] Binêrin, Rêxistina Efûya Navnetewî, *Tirkîye: Li Tirkîyê Serdegirtina Berfireh li Medyayê.* 8 Mijdar 2016. Li vir peyde dibe https://www.amnesty.org/en/documents/eur44/5112/2016/en/ Her wiha, Rêxistina Efûya Navnetewî *Tirkîye: Parlamenterên HDP di nav êrîşa zêdebar li ser dengên dijberên Kurd de hatin girtin.* 4 Mijdar 2016. Li vir peyde dibe https://www.amnesty.org/en/latest/news/2016/11/Tirkîye-12-kurdish-deputies-detained-amid-growing-onslaught-on-opposition-voices/
[37] Binêrin, Rêxistina Efûya Navnetewî , *Tirkîye çalakîyên bi sedan sazîyên sivîl rawestand,* 16 Mijdar. Li vir peyde dibe https://www.amnesty.org/en/documents/eur44/5141/2016/en/

Cotmehê de Qeymeqamê Navçeya Nisêbînê bibîne, lê ev daxwaz hat redkirin. Rêxistina Efûya Navnetewî dîtîyên xwe yên serekî pêşkêş kirin û di 28 de bi nameyekê ji Wezîrê Hundir bêtir agahî xwest.



*Dîmena satelîtî Sûrêdi 8'ê Mijdara 2015'an de nîşan dide, berî ku qedexeya derketina derve ya serekî di 11'ê Çileyê Pêşîn 2015'an de ket meriyetê. © Google Earth, DigitalGlobe*



*Dîmena satelîtî ku di 10 Gulan 2016an de, piştî pevketinên çekdaran û biryara "desteserkirina acil" di Adarê de hatiye girtin, nîşan dide ku beşekî girîng ê avahîyan li nîvê rojhilatê bajêr zirar dîtine yan hatine hilweşandin. © Google Earth, DigitalGlobe*

# 3. VALAKIRIN Û DERXISTINÊN BI DARÊ ZORÊ JI SÛRÊ

> **“Polîs ji cadeya mezin anons kir, wan got ku ji bo ewlehîya me divê em terka xanîyên xwe bikin. Her kesê li taxê nikanîbû anons bibihîsta, her kesî bang li hev dikir, digot, “Ji me re dibêjin, terk bikin”. Heta ku em derketin ser cadê, gelek mirov derketibûn jî, em bi hêla çepê ve çûn, dûre bi hêla rastê ve, da ku rû bi rûyî pevketinan nebin.”**
>
> Jina ji Sûrê, 11ê Çileyê Pêşîn, dema ku terka malên xwe kirin rave dike.

Qeymeqamîya Navçeya Sûrê qedexeya derve gelek caran daxuyand; di 6’ê Îlona 2015’an de dest pê kir (rojekê), 13’ê Îlonê (du rojan), 10’ê Cotmehê (çar rojan), 28’ê Mijdarê (sê rojan) dubare kir ta ku cara dawîn 11 Çileyê Pêşîn 2015’an jî bênavber bû (hîn jî li hin deveran didome). Hinek malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîne got ku piştî daxuyanîya qedexeya derve ya 28’ê Mijdarê terka taxê kirin; hinên din heta Çileyê Pêşîn 2015’an lê man. Piranîya mezin a malbatan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku di 11’ê Çileyê Pêşîn de, di seetên berî destpêka qedexeya derketina derve ya seet 4’ê piştî nîvro de terk kirin. Piştî rakirina qedexeya derve ya berî wê, şeva berî wê seet di 11’ê’ şevê de navbereke kurt çêbû.[38] Di nav malbatên ku terk kirin de ne tenê ew nifûsa li dor 24.000’an a şeş taxên di bin qedexeya derve de, lê rûniştîyên din ên Sûrê yên li deverên derdorê jî di nav de bûn, ji ber ku nêzîkbûna wan a deverê jîyana li wir bixeter û nemimkun dikir. Rayedarên şaredarîya Sûrê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku bi qasî 40.000 rûniştîyên Sûrê bi darê zorê ji navçeyê hatin derxistin.[39] Gelek kêm rûniştî demeke zêde di nav devera bin qedexeya derve de man. Ji bo yên ku man, piştî derenghiştinên zêde, rayedaran ji bo ku mirov derkevin, ji nîvê Sibatê heta destpêka Adarê di seetên dîyarkirî de rêzeyek “korîdorên ewlekarîyê” vekirin.[40] Tê

---

[38] Binêrin, Weqfa Mafê Mirovan a Tirkîyê, qedexeyên derve yên navbera *16 Tebax 2015-16 Tebax 2016 û sîvîlîn jîyan ji dest dayî, Şaneka Agahîyê,* 21 Tebax 2016. Li vir peyde dibe http://tihv.org.tr/16-agustos-2015-16-agustos-2016-tarihleri-arasinda-sokaga-cikma-yasaklari-ve-yasamini-yitiren-siviller-bilgi-notu/

[39] Hevpeyvîn bi Şaredarîya Sûrê re, Gulan 2016

[40] Binêrin, Milliyet, 14 kes ji Sûra Amedê hatin tahlîyekirin, 7 Adar 2016. Li vir peyde dibe http://www.milliyet.com.tr/diyarbakir-Sûr-dan-14-kisi-tahliye-gundem-2205773/

têxmînkirin ku nêzikî 60 mirovan di korîdorê re derketin.[41] Beşine şeş taxên hîn jî di bin qedexeya derve de bi tevayî vala dimînin.

Malbatên ji Sûrê derxistî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku gelek sedem hebûn ku ji bo terkkirinê zor didan wan. Malbatên ku piştî daxuyanîya qedexeya derve ya 28'ê Mijdarê terk kirin ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku piştî ku qedexeyên derketina derve yên dirêjkirî li cîhên din ên herêmê bihîstin, xwe mecbûr his kirin ku derkevin; di nav wan de Cizîr (heşt roj), Nisêbîn (14 roj) û Farqîn (12 roj) hebûn; wan ji wê encameke wiha derxist ku heke qedexeyeke derve ya ew qas demdirêj li Sûrê bihata ferzkirin, wan ê nikanîbûna deyax bikira. Jinekê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re rave kir ku jîyana bin qedexeya derve çi qas dijwar bû: "Ez bi du zarokan re di xênî de bûm, me hefteyekê av venexwar. Rojekê kapsuleke gaz(a hêsir) bera xênî dan. 20 rojan elektrîka me tunebû. Min dixwest terk bikim, lê cîhekî min tunebû ku biçûmayê."[42] Gelek kêm rûniştîyan hewl dan ku li malên xwe bimînin û li şûna wê di dema navbera 11ê Çileyê Pêşîn de, berî ku wê rojê seet di 16:00an de dîsa were bicîhkirin, derketin. Li gora qanûna navnetewî, sînorkirinên azadîya tevgerê, qedexeyên derve û fermanên bêcîhkirina rûniştîyan jî di nav de, divê li gora qanûnê bin.[43] Lê belê, ev qedexeya derketina derve li ser bingeheke şêlî ya di Qanûna Birebirîya Parêzgehan de hat bicîhkirin, ku ev qanûn qet qala qedexeyên derketina derve nake. Wek ku Komîsyona Venedîkê encam jê derxistiye, di testa qanûnîbûnê de bi ser nakeve, û ne li gor qanûnê ye.[44] Bi vê ronîkirinê, bi darê zorê bêcîhkirina rûniştîyan ji ber qedexeya derve ne li gora qanûnê ye, bi xwe kêfî ye, û Xala 12'an a PNMSS ku bêcîhkirina bi darê zorê qedexe dike, binpê dike.[45]

Rûniştîyan bi pir carî qala qutkirinên av û elektrîkê û kêmderfetîya xwegihandina xwarinê kir ku zor dida wan ku terk bikin. Qutkirin pir caran hema piştî bicîhkirina qedexeya derve pêk dihatin. Jinekê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wê û malbata wê di dema qedexeya derketina derve ya berî derketina wan de rêjeyên piçûk ên nanê kartû parve kirine û bi vî awayîwiha jîyane.[46] Jineke din got ku ava wê yekser piştî bicîhkirina qedexeya derketina derve qut bû û elektrîka wê jî çend rojan piştî wê qut bû.[47] Qutkirinên avê mijarên pêwîstîya ku dewlet yekser an neyekser dest nede mafê avê derxistin holê. Rûniştî îdia dikin ku rayedaran bi zaneyî di dema qedexeya derketina derve de xizmet qut kirin ku polîsekî li Sûrê jî ev yek piştrast kir; ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wan (polîs) av û elektrîk qut kirine ku takekesên çekdar ên ku şerê wan dikir bêmoral bikin.[48] Lê belê, rayedaran bi fermî înkar kir ku xizmet bi zaneyî hatine qutkirin, wan got ku qutkirin ji ber zirara pevketinên çekdaran pêk dihatin.[49] Malbatan her wiha ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku ew ji ewlehî û xweşîya bi taybetî zarokên xwe ditirsîyan û bifikar bûn ku heke di bin qedexeya derve de bimana wê ji xwendegehê bimana. Rûniştîyeke jin ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, "Ez ji ber mala xwe û hûrmûrên xwe bitirs bûm, lê belê bêyî ku tiştekî bi xwe re bînim, ji bo ku zarokên min ewle bin û ji xwendegehê nemînin, min terk kir. Ji xwe berê di bin qedexeyên derketina derve de ji dersan mabûn.[50]

Gelek malbatên ku di 11'ê Çileyê Pêşîn de piştî ku şeva berî wê qedexeya derve rabû terk kirin, ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku polîsan ew mecbûrî terkkirinê kirin, bi hoparloran ferman da wan ku terk bikin. Ew ên ku li nêzîkî wê rûdiniştin anons bihîstin, lê yên ku jê dûr rûdiniştin nebihîstin.[51] Rûniştîyan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wê roja ku qedexeya derketina derve wê bihata bicîhkirin, rûniştîyan bi lezûbez telefonî hev kir, nûçe gihandin hev ku polîs fermanê dide wan ku terk bikin.[52] Çend malbatan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku polîsan ew hişyar kirine ku heke li malên xwe bimînin ew ê ji bo wan ne ewle be û ku divê tavilê berî ku qedexeya derve ya nuh seet di 16:00'ê 11 Çileyê Pêşîn de bi cîh bibe, terk bikin. Di nav ewên ku ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku polîsan bi vî awayî zor daye wan ku terk bikin de malbatek hebû ku li derveyî devera qedexeya derketina derve ya di nav Sûrê de, lê nêzîkî wê bûn.[53] Parêzgerê

---

[41] Hevpeyvîn, Adar 2016
[42] Hevpeyvîn, Nîsan 2016
[43] Komîteya Mafên Mirovan a NY (KMM), *CCPR Şîroveya Gelemperî No. 27: Xal 12 (Azadîya Tevgerê)*, 2 Mijdar 1999, CCPR/C/21/Rev.1/Add.9, para 2. Li vir peyde dibe: http://www.refworld.org/docid/45139c394.html
[44] Xal 11(c) a Qanûnê, no. 5442 a li ser Birêvebirîya Parêzgehan dibêje: 'Wê erka parêzger hebe ku, li gel ên din, aştî û ewlehîyê, parêzbendîya kesayî, ewlehîya milkê xisûsî, xweşîya gel û desthilatîya bicîhkirina qanûna pêşîlêgirtinê biparêze.' Binêrin, her wiha Komîsyona Venedîkê, *Tirkîye – Nêrîna li ser Çarçoveya Hiqûqî ya ku qedexeyên derve bi rê ve dibe, ji alîyê Komîsyona Venedîkê ve di Dahnê wê yê Giştî yê 107an de hat pejirandin (Venedîk, 10-11 Hezîran 2016)*. Li vir peyde dibe http://www.Venedîk.coe.int/webforms/documents/?pdf=CDL-AD(2016)010-e
[45] Binêrin, Prensîp 6 a Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY. Li vir peyde dibe https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/G98/104/93/PDF/G9810493.pdf?OpenElement
[46] Hevpeyvîn bi malbatên ji Sûrê re, Hezîran 2016
[47] Hevpeyvîn, Hezîran 2016
[48] Gotûbêj, Hezîran 2016
[49] Hevpeyvîn bi Parêzgerê Amedê re, Gulan 2016
[50] Hevpeyvîn, Nîsan 2016
[51] Binêrin, bûyera A.C., rûpel 22
[52] Hevpeyvîn, Hezîran 2016
[53] Hevpeyvîn, Nîsan 2016

Amedê, di hevdîtineke bi Rêxistina Efûya Navnetewî re îdiaya ku polîsan zor daye xelkê ku Sûrê terk bikin red kir.[54]

Ên din ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku pevketinên çekdaran û nêzîkî malên wan bikaranîna hêzê ji alîyê hêzên ewlekarîyê ve ew mecbûr kirin ku terk bikin. Çend malbatan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku dema ku li Sûrê diman çend gule li dîwarên derve yên xanîyên wan ketin û ji ber dengê teqînan û pevketinên çekdarî ku li taxa wan pêk dihatin ji tirsan nikanîbûn raketina.[55] Malbatekê got ku dema ku hîn di xanîyê xwe de bûn, guleyekê beşekî dîwarekî xênî rûxand.[56]

Her kesî nikanîbû yan jî nedixwest terka mala xwe bike. Li nav sedemên ku malbatan ji bo xwestina mayîna li malên xwe dan Rêxistina Efûya Navnetewî, tirsa ku heke terk bikirina, wê zirar bidîtina yan bihatina talankirin jî hebû. Jinekê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku mala wê li devereke qedexeya derve ya 10 rojan bû. Piştî ku ji xênî derket, ew hat serobinkirin û hûrmûrên wê hatin rûxandin. Cîranên wê yên ku li malên xwe mabûn, malên wan bêzirar mabûn.[57] Xwesteka li malê mayin û windanekirina malên xwe bi taybetî di nav malbatên piştî di dema nakokîya 1980'yan û 1990'an bi darê zorê ji gundên xwe derxistî yên ku hatibûn Sûrê de xurt bû. Sazîyên Sivîl ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wan bawer dikir ku malbat her wiha ji bo ku nedixwestin ciwanên taxê yên ku bi polîs û leşkeran re pev diketin bi tenê bihêlin jî li Sûrê man, û yên din ji ber ku wiha his dikirin yan bi rastî ji alîyê PKKê ve dihatin tazyîqkirin, ku li deverê bimînin, da ku ciwanên wan li deverê bimînin û tev li pevketinên li dijî polîs û dewletê bibin.[58]

Dîyar e ku gelek ji yên ku terk kirin bi dilxwazî wiha nekirin. Sedemên kombûyî hebûn ku li gel tazyîq û xwestekên mayinê jî, zor didan malbatan ku malên xwe terk bikin. Her wiha dîyar e ku mercên qedexeya derve li taxan, qutkirinên xizmetên jîyanî, kêmderfetîya bidestxistina xwarin û avê, hebûna pevketinên çekdaran, li gel bikaranîna çekên giran û tanqan, kirin ku mayin ne mimkun be. Meriv nikane şik bike ku rûniştîyên Sûrê bi xwesteka xwe ya azad terk kirin, lê şik jê kêm e ku bi darê zorê hatin derxistin û bêcîhkirin.

[54] Hevpeyvîn, Hezîran 2016
[55] Hevpeyvîn, Hezîran 2016
[56] Hevpeyvîn, Hezîran 2016
[57] Hevpeyvîn, Hezîran 2016
[58] Hevpeyvînên Rêxistinên Sivîl Nîsan û Gulan 2016

# 4. MERCÊN BÊCÎHKIRINÊ

> **“Hemû jîyana min bi xizanî derbas bû, hebûna min tenê xanî bû, min tenê dixwest ku lawê min here zanîngehê. Nuha yek ji wan jî tuneye.”**
>
> Jin, rûniştîya Sûrê, wendakirina hêvîyê rave dike, piştî ku li gel mêrê xwe û pênc zarokên xwe tê bêcîhkirin, Hevpeyvîn, Gulan 2016

Hemû malbatên ku bi darê zorê ji Sûrê hatin derxistin ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîn, rave kirin ku divîya tenê bi hişyarîyeke çend seetan terka malên xwe bikirina, tu tiştek an pir kêm tişt bi xwe re bibirina. Gelekan hêvî kiribû ku wê pir zû vergerîyana malên xwe, û ji xwe cîhekî wan tunebû ku hûrmûrên xwe bibirina. Ji malbatên ku hevpeyvîn bi wan re hatin pêkanîn erebeyeke kesekî tunebû ku hûrmûrên xwe pê bibirina. Gelek malbat berî bêcîhkirinê di rewşeke xerab a aborî de bûn, malbatên mezin tenê hatineke wan a dê/bav hebû, yan jî zarokekî wan di aborîya neferîmî de bê ewlekarîya civakî û bê teserûfên ji bo rojên xerab dixebitî. Kêm zêde nîvê malbatan xwedîyên xanîyên xwe bûn, ên din kirêdarên demdirêj û erzan bûn. Gelekan got ku dema ku hatin bêcîhkirin karên wan ji dest çûn, an ji ber ku karsazîyên ku jê re kar dikirin di nav Sûrê de bûn û hatin girtin, an jî ji ber ku bi aborîya nefermî ya di nav Sûrê de girêdayî bûn û ew jî bi qedexeya derve û destpêka pevketinan têk çûbû. Dîsa jî yên din rave kir ku ji ber troma û bêpergalîya bêcîhkirina wan karên xwe winda kiribûn.  Lê belê hinek piştevanîya kirê û ji bo milkên ji dest çûyî, piştî derengîyeke dirêj qerebûyeke (tezmînat) bisînor hatibû dayin. Lê belê ev bergirî pir kêm têrkir dibûn. Malbatan rave kir ku nuhkirina hûrmûran û bicîhkirina mafên xwe yên xanîyên têrkir, perwerde û kar çi qasî dijwar bûye.  Lêkolîna Rêxistina Efûya Navnetewî raber dike ku rayedaran erkên xwe yên ji bo kesên bêcîhkirî yön wek pêşkêşkirina mafên aborî û civakî, xanîyên têrkir, standarda jîyan û perwerdeyê jî di nav de, bi cîh nehanîne.

## 4.1 XANÎ

Malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîn tevan got ku mercên wan ên aborî piştî ku ji Sûrê hatine derxistin pir xerab bûne. Piranîya mirovan bar kir deverên din ên Amedê yên kirêya erzan – li nav Sûrê bi xwe, Baglar an Kayapinarê, hindik ji wan jî bi merivên xwe re diman. Pênc malbatan di mehên piştî derxistina wan a ji Sûrê de qet nebe du caran bar kiriye, ji ber ku nikanîbûne kirê bidana. Malbatan gazin dikir ku pir caran ji ber ku ew an merivên wan xwedîyên xanîyan bûne kirê nedane, an ji bo malên xwe yên li Sûrê kirêyên erzan û li gora budçeya xwe dane, pirên xanîyên kevneşopî yên mezin û bi hewş li Sûrê ji bo malbatên wan ên mezin minasib bûn; nuha ji bo xanîyên kalîteya wan xerabtir û odeyên wan têra malbatên wan ên mezin nakin, gelekî zêdetir kirê didin. Gelek malbatên bêcîhkirî bi malbatên din ên ji Sûrê derxistî re xanî parve dikirin (Wek mînak di rûpel 21 de li malbata H.Y. binêrin). Ji yên ku berê li Sûrê kirê didan, kirêya wan a piştî bêcîhkirinê pirê caran ji ya berê %100 an 200 bêtir e. Nûnerên Sazîyên Sivîl ji

Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku piştî daxuyanîya qedexeya derve, ji ber zêdebûna daxwazê ya ji ber malbatên ji Sûrê derxistî, mesrefê cîhê herî erzan ê kirê jî pir zêde rabû.[59]

Parêzgerîya Amedê di Hezîrana 2016'an de ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku ji bo alîkarîya kirê ji 4.996 malbatên ji Sûrê bêcîhkirî re bi tevayî 22,740,312 TL (li dor 6.8 milyon Euro) pere pêşkêş kirine û ku 800 malbat bi mesrefê 1.767.682,36 TL (li dor 528.000 Euro) li hotelan hatine bi cîh kirin û 29 malbatan (109 kes) di 14'ê Hezîranê de (dema ku agahî hat dayin) mayina li hotelan didomand. Her çend tu ji malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevdîtin pêk anîne li hotelan nemabin jî, gelekan ji wan alîkarîya kirê wek pereyê neqit ji rayedaran sitendiye. Bi gelemperî malbatan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku 300TL (90 Euro) di meha pêşîn a bêcîhkirina wan de û piştî wê her meh 1000TL (300 Euro) serê malbatê sitendine. Her çend ev miqdar di piranîya rewşan de beramberî kirêya xanîyê alternatîv dibe jî, li cîhên ku malbatên fireh bi hev re di xanîyekî mezin de nediman, vî pereyî têra mesrefên din ên bi bêcîhkirinê re têkilîdar nedikir. Di nav van de zirara jidestçûna kar, raxistina xanîyên kirêkirî û nuhkirina hûrmûrên wan hene. Ji ber van sedeman, malbatan alîkarîya kirê bi pirayî ji bo dayina mesrefên jîyana xwe bi kar dihanîn û xanîyên wan pirê caran kêm kalîte, pir qerebalix û wek encam bê mobîlye bûn.

Her wiha malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîbûn û ku qet alîkarîya kirê nesitendibûn jî hebûn. Lêkolîna di Adar û Nîsana 2016an de li ser navê şaredarîyê pêkhatî, dît ku nêzîkî yek ji sê malbatên bêcîhkirî qet alîkarîya kirê nesitendine.[60] Di nav gazinên ku Rêxistina Efûya Navnetewî ji malbatan li ser piştevanîya kirê sitendine de ev hene:

- Agahî nedane wan ku kanin doza vî pereyî bikin û wek encam tevî ku di xanîyên kirê yên ne li gora budçeyên wan û ne mayînde de bûn jî, serî lê nedabûn.
- Alîkarîya kirê ji bo wan nehat qebûlkirin, ji ber ku her çend mecbûr mane ku terk bikin jî, malên wan li derveyê devera qedexeya derketina derve bûn. Parêzgerê Amedê înkar kir ku malbat bi van hêncetan ji alîkarîya kirê bêpar nehîştine.
- Ji bo ku piştevanîya kirê bistînin, divîya wan kaxetek îmze bikira ku wek encama "terorîzm"ê hatine bêcîhkirin, ku hinek rûniştîyan qebûl nedikir û nedixwest wiha bibêjin.
- Ku ew miqdar bêyî ku li hejmara endamên malbatê binêrin dihat dayin û ji ber wê yekê di hin rewşan de têrê nedikir. Gelek malbatên mezin di xanîyên mezin ên pirqatî û bi hewş de diman ku nuha li derveyî Sûrê ji bo kirê peyde nabin. Wek encam malbatên bêcîhkirî di daîreyên pir qerebalix de diman. Di hin rewşên din de malbat mecbûr man ku xanîyan parve bikin û wek encam zêde qerebalixî pêk hat. Wek mînak li doza H.Y. binêrin ku çar malbat, teva zarokên wan 12 kes di daîreyeke piçûk bi du odeyên xewê de diman (rûpel 21). Lêkolîna ku li ser navê şaredarîyê pêk hat, dît ku nêzîkî %50 rûniştvanên bêcîhkirî berê li xanîyên Sûrê yên pirqatî û bi hewş dijîyan.
- Ku ji Gulana 2016'an û pey ve, heke yek ji endamên malbatê karekî fermî bike, dayina pereyan radiweste, yan jî li gora projeyeke alîkarîya hikûmetê jê re karek hatibe pêşniyarkirin (li jêr li standarda jîyanê binêrin), bêyî ku binêrin ka hatina wan têra kirê dike yan na. Ji şeş malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî di Îlonê de bi wan re hevpeyvîn pêk anîn, tenê yekê hîn jî alîkarîya kirê ji rayedaran distand. Di eslê xwe de, hemû malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîne ku piştevanîya kirê sitendine got ku teva ku alîkarîya kirê ya ku sitendin beramberî kirê hat jî, beramberî raxistina xanîyên wan nehat, piştî ku hûrmûrên wan ji ber bêcîhkirina wan ji dest çûn. Wek encam, malbat di daîreyên hema hema neraxistî de man an jî wan ji sazîyên sivîl û takekesan hêvî kir ku tiştên wek sarker û pêwîstîyên din pêşkêş bikin. Qerebûya cuda ya ji bo hûrmûrên jidestçûyî dereng ma û beramberî windayîyan nebû (li rûpel 18 binêrin).

# 4.2 STANDARDA JÎYANÊ

Hem rayedarên hikûmeta navendî û hem jî yên şaredarîya bajarê mezin a Amedê û şaredarîya navçeya Sûrê bi koordînasyona Sazîyên Sivîl re ketin nav hewldanan ku kêmasîya hatinê û tiştên malbatên ji Sûrê derxistî telafî bikin. Parêzgerîya Amedê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku rayedarên hikûmeta navendî bi kursên pîşeyî û bernameyên kar ên bi mûçe di navbera Sibat û Hezîrana 2016an de alîkarîya 3.617 mirovan kiriye.[61] Lê belê, malbatan pir caran ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku mûçeyê kesekî di nav malbatê de têra piştevanîya malbata wan nedikir.[62] Parêzgerîya Amedê her wiha got ku ji karsazîyên piçûk re alîkarîya

[59] Hevpeyvîn, Nîsan û Gulan 2016
[60] Hevpeyvîn bi nûnerê Sazîya Nedewletî re, Gulan 2016.
[61] Agahîya ku Parêzgerîya Amedê pêşkêş kiriye, Hezîran 2016
[62] Hevpeyvîn, Hezîran 2016

xwarin, betanîye, kinc û pereyê neqit kiriye û konek bi rê ve birine ku di dema meha rojîya Remezanê de xwarinên bêpere pêşkêş kirine.[63] Rayedarên şaredarîyê û çend Sazîyên Sivîl ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku tevî ku çavkanîyên wan bisînor bûn û ji xwe zor lê dihat jî bexiş didan hejmareke mezin a penaberên Kurd ên ji Iraq û Sûrîyê ku li Amedê dijîyan.[64] Sazîyeke din a Sivîl got ku ji ber xizanîya zêde di nav Sûrê de, wan hîn berî daxuyanîya qedexeya derve tiştên xwarinê didan bi qasî 500 malbatên li Sûrê.[65] Li gel van hewldanan jî, zelal bû ku gelek malbatên bêcîhkirî, wek encama bêcîhkirina wan, bêtir ber bi xizanîyê ve hatine delkandin (dehfandin), ji ber windayîyên bi ser hev de yên xanî, kar, zêdebûna mesrefên jîyanê, rewşa jîyana wan ê di dema dirêj de nikanîbûya bihata domandin.

# 4.3 JIDESTÇÛNA WINDA HÛRMÛRAN

Hemû malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîn dan zanîn ku bêyî ku hûrmûrekî xwe bi xwe re bibin, xanîyên xwe terk kirine. Gelekan bersîv da ku wan tenê bi kincên li ser xwe terk kiriye.[66] Tu ji malbatên bêcîhkirî ku Amnesty International di Nîsanê de bi wan re hevpeyvîn pêk anîne, nedizanî ku mal û hûrmûrên wan bêzirar mane yan na.[67] Di Hezîranê de, Rêxistina Efûya Navnetewî li gel malbatên ku vedigerîyan malên xwe çû devera 14 cadeyan ku qedexeya derve jê rabûbû. Rêxistina Efûya Navnetewîçavdêrî kir ku mal hatine serobinkirin, hûrmûr gelek caran hatine şewitandin an jî rûxandin. Malbatan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku hûrmûrên binirx ên wek alavên gewr û alavên elektrîkê, gule bera wan dane û rûxandine, wek ku xuya dibû bi zaneyî ev tişt pêk hatiye. Malbatan her wiha da zanîn ku tiştên buha yên wek xişir, doşekên hirî yên bi dest çêkirî, sindoqên cihîzên keçikan û alavên elektrîkî di dema qedexeya derve de ji xanîyên wan hatibûn talankirin.[68] Tesîra li ser malbatan zêde bûbû ji ber vê rastîyê ku ji bo gelekan dewlemendîya wan ji teserûfên wan bêtir xanîyên wan û hûrmûrên nav malê bû. Tesîra jidestçûnanwinda û rûxandina hûrmûrên rûniştîyan a li ser kanîna vegerê ya wan li jêr tê nirxandin, rûpel 26. Rûxandin, windayî, nekanîna birina hûrmûran an sitendina qerebûya têrkir û di demê de jî, di zêdekirina dijwarîya ku malbatên bêcîhkirî rûbirû bûne de faktorine girîng in. Tu ji malbatên ku berî Îlonê bi wan re hevpeyvîn hatine pêkanîn bi tu awayî ji rayedaran qerebûya jidestçûna hûrmûrên xwe nesitendiye, her çend rayedar çûbin hin ji malên wan ku nirxandinên zirarê pêk bînin jî. Ji şeş malbat û malbatên fireh ên ku di Îlonê de bi wan re hevpeyvîn pêk hatine, ji hemûyan re ji bo windakirina hûrmûrên wan qerebû hatiye pêşniyarkirin. Piranîya malbatan ji wan re di navbera 3.000TL û 5.000TL (900- 1500 Euro)an de ji bo jidestçûnawinda hûrmûrên wan qerebû hatine pêşkêş kirin û qebûl kirine, her çend di piranîya rewşan de nirxa hûrmûrên wan qet nebe 40.000TL (12.000 Euro) hatibe hesibandin û hejmar têra beramberîya pêwîstîyên raxistina maleke nuh neke jî. Ji bilî yekê hemû malbatan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotiye ku ji ber ku rayedaran ji wan re gotiye ku heke qebûl nekin, ew ê tiştekî nesitînin, ji bo qebûlkirina pereyên qerebûyê kaxet îmze kirine.[69] Zilamekî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku malbata wî dayineke qerebûyê ya 7.000TL (2.000 Euro) red kiribû û hûrmûrên ji 100.000TL (30.000 Euro) gelekî bêtir ji dest wan çûbûn.[70]

# 4.4 PERWERDE

Malbatên bêcîhkirî yên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîne pir caran di nav tesîrên herî neyînî yên bêcîhkirina xwe de, fikarên ji bo perwerdeya zarokên xwe dîyar kirine. Malbatan dan zanîn ku ji ber bêewlehîya li Sûrê ya berî bêcîhkirinê, zarok ji xwe ji xwendegehê mabûn. Pir caran fikarên ji bo perwerdeya zarokên xwe wek faktoreke terkkirina malên xwe dîyar kirin.[71] Lê belê, ji ber sedemên cîhereng, trawmaya bêcîhkirinê jî di nav de, dijwarîya hînbûna hawirdora xwe ya nuh û dijwarîyên aborî ku nehiştine ku malbat mesrefên perwerdeya zarokên xwe bidin, zarokên bêcîhkirî ji xwendegehê mane û hinek ji wan ji bêcîhkirina wan û vir ve li xwendegehê venegerîyane. Rayedaran ji bo ku zarok perwerdeya xwe bidomînin hin gav avêtine. Parêzgerîyê bi Rêxistina Efûya Navnetewî da zanîn ku ji 4784 xwendekarên li şeş xwendegehên li şeş taxên bin qedexeya derve ya Hezîranê qeydkirî, ji 1.927 xwendekaran re rêwîtîya bêpere hat pêşkêşkirin, ku yek ji mesrefên bi domandina perwerdeyê re têkilîdar e; 2.857 (yên mayî) xwendekar jî bêyî pêşkêşkirina rêwîtîyê li xwendegehên alternatîv hatin qeydkirin. Ev hejmar bi hesabên civaka sîvîl re bi awayekî di nakokîyê de ne. Lêkolîna ji alîyê sazîyeke nedewletî li ser navê şaredarîyê di Nîsanê de pêkhênayî

[63] Ibid
[64] Hevpeyvîn, Nîsan, Gulan 2016
[65] Hevpeyvîn, 19 Gulan 2016
[66] Hevpeyvîn, Nîsan 2016
[67] Hevpeyvîn, Nîsan 2016
[68] Hevpeyvîn, Gulan, Hezîran 2016
[69] Hevpeyvîn, Îlon 2016
[70] Binêrin, malbata H.Y., rûpel 21
[71] Hevpeyvîn, Nîsan 2016

dît ku wê demê tenê yek ji sê xwendekaran perwerdeya xwe didomand.[72] Agahîya ku Egitim-Sena sendîkaya perwerdeyî pêşkêş kiriye, dîyar kir ku di nav deverên Sûrê yên di bin qedexeya derketina derve de 15 xwendegeh û bi tevayî 7450 xwendekar hebûne. Ew rastî hin bûyeran hatine ku zarokên bêcîhkirî ji ber ku nikanîbûn hînî xwendegehên xwe yên nuh bibin, neçûbûn xwendegehê.[73] Her çend piranîya malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî pê re peyivîye da zanîn ku zarokên wan ên temenê xwendegehê heta Gulanê vegerîyane xwendegehê jî, wan got ku haya wan ji tu rêwîtîya bêpere ya ji wan re pêşkêşkirî tunebûye.[74] Sazîyeke Sivîl ku lêkolîneke malbatên bêcîhkirî pêk anîye ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku her çend zarokên malbatên bêcîhkirî di teorîyê de kanîbûn xwe li xwendegehên nuh qeyd bikirina jî, tevlihevîya bêcîhkirina wan û dijwarîyên aborî bûne sedem ku gelek zarok bi mehan ji perwerdeyê bimînin. Sazîya Sivîl got ku rewş bi taybetî ji bo keçan xerab bû, ku ji xwe ji zarokan kêmtir çûbûn xwendegehê û li gel vekişîna ji perwerdeyê, keçik dikevin nav rîska zewaca zû û bi zorê jî, ji ber neewlebûna mezintir û dijwarîyên aborî yên malbatan.[75]

[72] Hevpeyvîn, Gulan 2016
[73] Yekîtîya şaredarîyên Herêma Başûrê Rojhilêt (GABB), *Nirxandina Zirarê û Rapora Koçberîya bi Darê Zorê,* Hezîran 2016, r. 10. Li vir peyde dibe: http://www.gabb.gov.tr/doc/2016/07/gabbhasartespit/GABB-Report-EN.pdf
[74] Hevpeyvîn, Hezîran 2016
[75] Hevpeyvîn, Gulan 2016

# MALBATÊN SÛRÊ

## S.K.



*S.K. li xanîyê xwe yê li navçeya Rezan a Amedê. © Guy Martin/Panos*

S.K. di 1944’an de hatiye dinyê, karê badanayê dikir. Xanîyê wan yekî kevn, li taxa Hasir bû. Di 1968’an de hatin xênî. Şeş zarokên wan û du bûkên wan hebûn. Bi giştî 10 mirov li xênî dijîn. S.K. di Hezîranê de ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, “Hîn jî qedexeya derketina derve lê heye. Cîranan got ku hatiye rûxandin. “Ez bawer nakim ku dîwarên kevirên bazalt hatibin rûxandin. 200 an 300 salî bûn. Min digot qey tiştek nikane wan birûxîne”. Ez êdî nikanim bigirîm jî, ez li ser jidestçûyina xanîyê xwe ew çend girîyam”. S.K. ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku li hewşa xênî şeş ode hebûn. “25 mirîşk û 20 kevokên min hebûn. Ez nizanim çi bi serê wan de hat. Dareke hejîrê, bîrek û birkeke piçûk li hewşê hebûn. Dema ku qedexeya derve li kar bû û av hatibû qutkirin, me av ji kanîyê vedixwar.”

Di Hezîranê de S.K. ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku wî ji bo vegera cîh serî lê daye, lê destûr nehatiye. Rêxistina Efûya Navnetewî di Îlonê de bi bûka wî re peyivî. S.K. û jina wî bar kiribûn mala xwe ya li Rezan. Wê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, “S.K. di Tebaxê de çû ku xênî bibîne. Dîwarên xênî tev rûxandibûn. Tiştek li paş nemaye. Hîn jî ji bo kirê alîkarîya peran disitînin, lê belê ji bo qerebûya hûrmûrên wan û ku wê çi bê serê xênî, hîn tu nûçe tuneye.”

## H.Y.




*H.Y. û malbata wî ya fireh li daîreya xwe ya kirê li Talaytepe'yê, dûrî Sûrê. © Guy Martin/Panos*

H.Y. û malbata wî ya fireh heta ku bi daxuyanîya qedexeya derketina derve re zor li wan dan ku terk bikin, li Sûrê mane. Wî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku li taxa Cemal Yilmaz a Sûrê çar xanîyên wan ên cuda hebûne. Nuha her çar malbat bi hev re di xanîyekî sosyalê yê bi du odeyên xewê li Talaytepeyê bi kirê dimînin. Dema ku Rêxistina Efûya Navnetewî di Hezîranê de bi H.Y. re peyivî, wî daxwaz kiribû ku here xanîyên xwe yên li herêma hîn di bin qedexeya derketina derve de bibîne, lê destûr nesitendibû. Cîranên wan ji wan re got ku hemû mobîlye hatibûn rûxandin. H.Y. fîlmçêker e. Ya ku ew dixist fikaran lensên kamerayê yên buha yên li malê bûn. Wî teqez dizanî ku nuha hatine rûxandin an jî muhtemelen hatine dizîn. Li gora cîranan, xanîyê birayê wî S.Y. bi tevayî hatiye rûxandin. Ji cîranan bihîstine ku hatiye şewitandin, lê di dawîya operasyonên leşkerî de hîn li ser xwe bûye. S.Y. di Nîsanê de serî lê da ku here bibîne, lê heta Hezîranê hîn destûr nehatibû ku xanîyê xwe bibîne. H.Y. ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, "Malbata me ya mezin a li dor 500 kesan hemû di heman navçeya Sûrê de jîyane, me her roj li kuçê hevdu didît û em bi hev re dipeyivîn. Nuha em li seranserî Amedê belav bûne û tenê bi telefonê dipeyivin."

Rêxistina Efûya Navnetewî di Îlona 2016'an de dîsa bi H.Y. re peyivî. Destûr jê re hatibû dayin ku biçe mala xwe ya hîn di bin qedexeya derve de bibîne. "Ez du meh berê çûm. Metbex bi tevayî hatibû wêrankirin, perçe perçe bûbû. Li dîwarekî qulek hebû. Mobîlye tev hatibûn şikandin. Tiştekî ku bihata bikaranîn nemabû û alavên kamerayê çûbûn. Birayê wî bi şûn ve çû ku mala xwe bibîne. Li devera ku berê lê bû, dever bi tevayî bi erdê re rast kiribûn. Wî got ku rayedaran ji bo windayîyên hûrmûrên wan pêşîniyar ji wan re kirine. Ji keçekê re 3000TL (900 Euro) ji bo malbata wê pêşniyar kirine, û pêşniyar red kirine. Ji keçeke din re ji bo yên wê 7.000TL (2.100 Euro) pêşniyar kirine, û qebûl kirine. Ji wî û birayê wî re ji bo her yekî 7.000TL (2.100 Euro) û 5.000TL (1.500 Euro) pêşniyar kirine, her duyan jî ew miqdar red kirine. Hûrmûrên mala birayê wî hêjayî 40.000TL (12.000 Euro) ne. H.Y. got ku alavên wî yên kamerayê bi tenê hêjayî bêtirî 100.000TL (30.000 Euro) bûn. H.Y. li ser jidestçûna xanîyên wan wiha got, "Ez çûm nivîsgeha parêzger. Qet agahîyê nadin, tu pêşniyaran nakin. Tenê dibêjin tapûyên xwe bînin." Ji malbata H.Y. kesek ji bo alîkarîya kirê ji Parêzgerîyê peran nastîne.

## A.C.

A.C. li dor 45 salî ye. Hemû jîyana xwe li Amedê bihurandiye. Ji hatina xwe ya bajêr a dema zewaca 30 sal berê û wir ve li taxa Savas a Sûrê maye. Bi mêrê xwe û çar zarokên xwe re çar salan li vî xanîyî jîyaye, ku xanîyekî kevn ê Ermenan e. Ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, "Di dema qedexeya derve de em sê rojan li vir man, gule hatin xênî, dengê teqînan û çekan dihatin me. Em di fikara jîyana xwe de bûn." Dema ku wêne hat girtin, A.C. û malbata wê hewl dida ku xênî paqij bikin, da ku bi şûn ve bar bikin. Yek ji 14 cadeyên şeş taxan e ku di Gulana 2016'an de qedexeya derve ji ser rabû. Ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, "Dema ku em vegerîyan malê, me dît ku hemû hûrmûrên me şikandibûn û li hewşê avêtibûn ser hev. Televîzyon bûbû du perçe. Ew [rayedarên dewletê] hatin ku zirarê binirxînin. Nizanim ku ew ê çi qasî bidin. Min biryara desteserkirinê bihîstiye, lê tenê ji mirovên li taxê, li ser wê qet bi tiştekî nizanim." Bûka wê ya ku li cadeya nêzîk rûdinişt ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, "Ez di şeş salîya xwe de hatim vir, ev cara duyem e ku zorê didin min ku ji vir derkevim. Em di bin qedexeya derve de şeş rojan li vir man. Dengê teqînan û çekan dihatin me. Roketek li dîwarekî ket. Xwarina me tenê nan bû ku me parve dikir. Di dawîyê de pir kêm mabû."

Rêxistina Efûya Navnetewî di Îlona 2016'an de dîsa bi malbatê re peyivî. Tevî ku qedexeya derve ji herêmê hatibû rakirin jî, ji ber ku "zirar zêde bû û polîs li wir me diçewisîne," nikanîbûn vegerin malên xwe. Ji her malbatekê re hefteyek berê ji bo jidestçûyina hûrmûrên wan 3.000TL (900 Euro) qerebû hatibû pêşniyarkirin. Bûkê got, "Me dikira îtiraz bikira, lê belê wan got ku ya ku em bisitînin tev ew e, loma me îmze kir."

## Ş.A. Û Î.A.

Xanîyê Ş.A. û Î.A., li taxa Alipasa li alîyê din ê Sûrê yê devera bin qedexeya derve ye. Ş.A. di Hezîranê de ji Amnesty International re got, "Tenê ji bo deh rojan di bin qedexeya derve de bû. Mirovên ku neçûn, xanîyên xwe parastin. Gelek ji ewên ku çûn, malên wan hatin talankirin. Hemû odeyên li dora hewşê hatine wêrankirin û kevir û kuçik li odeyan qûç bûne. Ketina hindur wan ne mimkun bû. Sofaya li hewşê berê li qatê yekê yê xênî bû. Hûrmûrên me tev hatine rûxandin. Seeta avê hatiye rakirin. Ş.A'ê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku xanî yê kalikê wê bûye. Çûn cem rayedaran ku windayî û ziraran bidin zanîn, lê kesek nehat ku nirxandinê bike.

Ş.A'ê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, "Me ji bo kirê tu qerebû wernegirtiye. Bêyî ku windayîyên me qerebû bibin, derfetên me yên vegera malê çênabin. Em dixwazin ji bo windayîyên me ji me re qerebû bê dayin û em vegerin mala xwe. Piştî ku me terk kir, em çar mehan li xanîyekî man, me her meh 300TL kirê dida, dûre me bar kir xanîyekî din (li Sûrê), ji ber ku ew erzantir bû, meha wî bi 250TL.

Î.A. di Îlonê de dîsa bi Rêxistina Efûya Navnetewî re peyivî. Wî wiha got,"Wan [rayedaran] ji bo jidestçûna hûrmûrên me 3.000TL (900 Euro) dan. Em nikanin bi vê miqdara peran vegerin xênî. Em hîn jî nizanin wê çi were serê xênî. Ez çûm daîrê, lê gotin ku nizanin wê di nav projeyê (ya avadanîyê) keve yan na. Tiştekî din nabêjin. Xanî wê were hilweşandin, loma qet nebe ji bo wê bila qerebûyê bidin me. Nuha xanî talankirî û ne ewle ye. Bê destûr tê de dimînin. Em nikanin herinê jî."

## O.Z.



Ö.Z. û malbata wî li gel hûrmûrên xwe yên li xanîyê xwe yê li Sûrê. © Guy Martin/Panos

Xanîyê O.Z. û malbata wî li herêma piçûk a Sûrê ye ku qedexeya derve di Gulanê de jê rabûbû. O.Z. û malbata wî di Hezîranê de bi Rêxistina Efûya Navnetewî re peyivîn, dema ku vegerîyabûn xanîyê xwe û hewl didan ku wî vegerînin rewşeke jîyanbar. Wî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re wiha got, “Bavê min, birayê min û ez lê man. Me nexwest ku terka xênî bikin. Dema ku polîsên operasyonên taybetî hatin xanîyê me û çek dan serê me ku bi zorê em terk bikin, em çûn.” Polîs ji me re got, “Hin bisiûd in, polîsên operasyonên taybetî kesekî jîndar wernagire”. O.Z. ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku ew birine ber dadgehê û bi sûcên terorîzmê doz li wan vekirine. Polîsan di rapora xwe de gotine ku ew li kuçê ne li xanîyê xwe hatibûn girtin. Dema ku dadger dît ku şimik li pêyên wan û bê gore bûn, awayekî ne muhtemel ê di serma Çileyê Pêşîn de, ji malê derketinê, ew berî darizandinê nedane girtin. Her çar endamên jin ên malbatê piştî ku zilam ji alîyê polîs ve hatin girtin, derketin. Dema ku piştî bêtirî pênc mehan vegerîyan, dîtin ku hûrmûrên wan şewitandî û li hewşê li ser hev civandî bûn. Ji bo ku gend û gilêşê ji xênî rakin, 10 rojan xebat kirin. Li dîwaran sloganên nijadperest û nasyonalîzma Tirkan hebûn û xuya dibû ku polîsan xanî wek baregeh bi kar anîbû. Xanî hatibû talankirin, xişir winda bûn, kincên binî yên jinan ji berkêşkan hatibûn derxistin û li erdê hatibûn hiştin.  Xwarina ku nehatibû xwarin li Odeya ku portreyê O.Z. hatibû girtin hiştibûn û genî bûbû. Her roj li xênî dixebitîn ku kanibin dîsa lê bijîn, lê berî şevê jê diçûn. O.Z. ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got, “Polîs mirovan bişev nerehet dikin, lê em dixwazin bi şûn ve bar bikin, em ê piştî cejnê şûnve bar bikin.” Bavê O.Z. li kuçê saet difirotin û pê debara xwe dikir. “Li xênî 2.000 saet hebûn. Ew hemû winda bûn an hatibûn rûxandin. Dema ku rayedar hatin ku zirarê binirxînin, meqbûzên tiştên windayî xwestin. Heke her tişt şewitandî be, tu yê çawa meqbûzan raber bikî?”

## S.A. Û M.A.



*S.A. û M.A. li gel hinek ji zarok û nevîyên xwe. © Guy Martin/Panos*

S.A. 64 salî ye; jina wî M.A. 57. Heft zarok û 11 nevîyên wan hene. Dema ku wan zor da wan ku xênî biterikînin, nevîyê herî piçûk 15 rojî bû. (Di wêne de di li himêza xaltîka xwe ye.) Dema ku wêne di Hezîranê de hat girtin, ew heft mehî bû. Bi hev re li Sûrê xwedîyê sê xanîyan bûn. Û yek jî dabûn kirê. Nuha tev di çar xanîyên kirê de ne. “Me her tiştê ji 45 salên zewaca me mayî winda kir. 15 doşekên me yên ji hirîyê hebûn. Hemû windayî ne. Dema ku em li xênî vegerîyan, di makîna kincan, TV, klîma û qeşadankê de qulên guleyan hebûn. Cihîz tev çûbûn.”

Rêxistina Efûya Navnetewî di Îlonê de dîsa bi S.A û M.A. re peyivî, ji bo windayîyên hûrmûrên nav mala wan ji wan re 5.000TL (1.500 Euro) qerebû hatibû pêşniyarkirin. Wan got, “Me qebûl nekir. Me daxwaznameyek pêşkêş kir. Ez nizanim wê çi biqewime. Windayîyên me hêjayî 60 – 70.000TL ne. Me li rewşa xênî pirsî, lê ji bo me li cem wan tu agahî tunebû, wan tapû nexwest.” Jin û mêr hîn jî her meh 1.000TL (300 Euro) alîkarîya kirê disitînin, ji ber ku kes ji wan naxebite. Keçika wan ji bo kirê alîkarîyê wernagire. Keçeke wan ji bo windabûna hûrmûrên malê 5.000TL (1.500 Euro) qerebû sitendiye. Wê got ku rayedaran jê re wiha gotiye, “Vî pereyî bisitîne, an na tu yê tiştekî nestînî.”

# 5. HÊVÎYÊN VEGERÊ

> **“Malbata me ya fireh a ku li dor 500 mirovan pêkhatî, tev li heman taxa Sûrê dijîyan, me her roj li kuçê hevdu didît. Nuha em li seranserî Amedê belav bûne û tenê bi telefonê dipeyivin.”**
>
> H.Y.

Erka hikûmeta Tirkîyê heye ku vegera dilxwazî ya kesên bêcîhkirî li malên wan an cîhên ku lê diman saz bike, ev yek ji mafê azadîya tevgerê û hilbijartina cîhê lêmayinê tê ku di Xala 12’an a PNMSS de tê dîyarkirin.[76] Wek ku di Rêbera NY a prensîpên vegera bêcîhkirîyan de dîyar dibe, “erk û berpirsîya serekî ya rayedarên desthilat heye ku li gel pêşkêşkirina îmkanan, şert û mercan jî saz bikin ku bikin ku kesên di nav welêt de bêcîhkirî bi dilxwazî, ewlehî û serbilindî vegerin malên xwe yan cîhên ku lê diman, an jî bi dilxwazî li beşekî din ê welêt bi cîh bibin. Divê rayedarên wiha hewl bidin ku reîntegrasyona kesên di nav welêt de bêcîhkirî yên vegerîyayî yan li dereke din bicîhbûyî saz bikin.”[77] Divê her wiha rayedar kesên di nav welêt de bêcîhkirî bi giştî tev li pîlankirin û rêvebirina veger, bicîhbûn û reîntegrasyona wan bikin. Divê teqez bikin ku kesên bêcîhkirî yên ku vedigerin, kanibin milk û hûrmûrên xwe bi şûn ve bistînin; heke ev ne mimkun be, divê teqez bikin ku qerebûyeke minasib bistînin.[78] Her wiha mecbûr in ku nehêlin bêcîhkirin ji qasî ku şert û merc pêwîst dikin, dirêjtir bibe.[79]

Lê belê salek di ser re çû, piranîya rûniştîyên ji şeş taxên Sûrê yên bin qedexeya derketina derve li gel hindikahîyek rûniştîyên ji taxên din ên Sûrê, hîn jî bêcîhkirî ne. Ya ku fikaran dide ew e ku pîlaneke hikûmetê ya berbiçav û ji gel re vekirî ji bo vegerê tuneye, ne jî hewldaneke ji dil heye ku bi rûniştîyan bişêwirin an jî wan tev li pîlankirina vegera wan bikin.

Hikûmetê bal kişandiye ser pîlanên xwe yên avadanî û razemeniyê yên xwezîkar li başûrê rojhilatê Tirkîyê.[80] Serokwezîrê wê demê Ahmet Davutoglu hez dikir ku bibêje wê Sûrê bikin “Toledoya nuh”, bajarê Îspanyayê referans dikir.[81] Rûniştîyên Sûrê yên bêcîhkirî ku bi Rêxistina Efûya Navnetewî re peyivîne qet ji dilsozî û xwestina hikûmetê ya ku wan bide vegerandin ne bi bawer bûn. Lêkolîneke sazîyeke sivîl ya ji bo şaredarîyê

---

[76] Nivîskarê Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY, Francis Deng, li ser bingeha mafê vegerê wiha got, “Rêzikeke gelemperî tuneye ku mafê kesên di nav welêt de bêcîhkirî yê vegera cîhên xwe yên berê an barkirina cîhekî din ê ku bi xwe tercîh dikin, tesdîq bike. Lê belê, mafekî wiha kane, wek prensîp, ji Azadîya Tevgerê û mafê hilbijartina cîhê xwe yê lêmayinê bê derxistin. Repora Nûnerê Sekreterê Giştî, Birêz Francis M. Deng, piştî biryara 1995/57’an a Mafê Mirovan hat pêşkêşkirin. Hevdan û analîza normên hiqûqî, para 242. Li vir peyde dibe https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/G95/146/89/PDF/G9514689.pdf?OpenElement

[77] Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY, Prensîp 28/1

[78] Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY, Prensîp 29/2

[79] Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY, Prensîp 6/3

[80] Anadolu Ajansi, *Serokwezîrê Tirk pakêta ekonomîk a ji bo rojhilatê Tirkîyê dîyar kir,* 4 Îlon 2016. Li vir peyde dibe http://aa.com.tr/en/politics/turkish-pm-reveals-economic-package-for-eastern-Tirkîye/640803. HaberTürk, *Başbakan, Diyarbakır'da yatırım destek paketini açıkladı,* 4 Îlon 2016. Li vir peyde dibe http://www.haberturk.com/ekonomi/is-yasam/haber/1292115-basbakan-yildirimdan-dogu-ve-guneydogu-anadoluya-yatirim-mujdesi

[81] Milliyet, *Davutoğlu: “Sûr ê bibe wek Toledo”,* 1 Sibat 2016. Li vir peyde dibe http://www.milliyet.com.tr/davutoglu-Sûr-toledo-gibi-olacak-ankara-yerelhaber-1191664/

pêkhatî, dît ku %95ên rûniştîyên bêcîhkirî dixwest vegerin malên xwe yên li Sûrê.[82] Sedemên daxwaza vegerê yên ku rûniştîyên Sûrê yên bêcîhkirî ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin, ji hev cuda bûn. Gelekan qala hawirdora bêhempa ya kuçeyên kevnar ên bêtrafîk ku zarokan lê dilîstin dikir; ên din mijara civaka ku di dewreke dirêj de pêkhatibû derdixistin pêş. Kesên ku berê bi darê zorê ji gundên xwe yên li başûrê rojhilêt hatibûn derxistin, bi taybetî israr dikir ku divê vegerin malên xwe yên li Sûrê. Sedema ku rûniştîyên Sûrê herî zêde dianîn ziman ew bû ku wan kuçe bi malbatên xwe yên fireh re parve dikirin û hînî jîyana ji hev cîhê nabin.

Yek ji astengên ku nahêlin rûniştîyên Sûrê vegerin malên xwe zirar an bi tevayî rûxandina xanîyên wan e. Di rewşên ku tax heta bi 10 rojan kêm bi qedexeya derve mane de, malên hin rûniştîyan bi awayekî hatine serobinkirin ku êdî tê de nikanin bijîn (li rewşa Î.A. û Ş.A. binêrin, rûpel 22). Her wiha li kuçên devera serekî yên ku qedexeya derve rabûye jî, zirara li xanîyan nehiştiye ku rûniştî vegerin (li rewşa A.C. binêrin, rûpel 22). Pevketinên çekdaran û operasyonên polîs û leşkeran ku ji dawîya Mijdara 2015'an heta 9'ê Adara 2016'an dom kirin û bikaranîna çekên giran ji alîyê hêzên ewlekarîyê yên Tirk ve, bûn sedema zirara pir giran. Gelek xanî jî piştî bidawîanîna operasyonên ewlekarîyê hatine hilweşandin (ji bo dereca wê li dîmenên satelîtê yên Sûrê binêrin, rûpel 12). Malbatan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku dema ku çûn ku xanîyên xwe yên ku cîranan gotibûn piştî operasyonên ewlekarîyê li ser lingan mane, bibînin, dîtin ku xanîyên wan bi bûldozerê hatine xirabkirin.[83] Li gora raporan, ji 5.200 xanîyên li pênc taxan, 1.750 heta Cotmeha 2016'an hatine hilweşandin û qet nebe 500'ên din xistine nav bernameya hilweşandinê.[84] Rayedaran ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku Wezîrê Hawirdor û Pîlansazîya Bajaran ji bo zirara li avahîyan nirxandinek pêk anîye û rapor saz kirine, lê ew ji bo rûniştîyan nayên pêşkêşkirin.[85] Dibêjin ku agahîya di prosesê de ji alîyê parêzgerîyê ve tê dayin. Ew îdia nakin ku bi rûniştîyên ku malên wan hatine rûxandin şêwirîne ku divê xanîyên wan bên tamîrkirin an hilweşandin. Çar malbatên ku bi Rêxistina Efûya Navnetewî re peyivîne, got ku tenê dema ku destûr sitendin û çûn devera bin qedexeya derve, wan rewşa xanîyên xwe dît û lê hay bûn ku hatine hilweşandin.[86] Ji kesekî ji wan re nirxandinên zirara li xanîyên wan an hênceta hilweşandina wan nehatine raberkirin. Rastîya ku bêyî zanîn, şêwirdarî yan pejirandinê, xanî tên hilweşandin, dîyar nake ku hikûmet ê erkên xwe bi cîh bîne ku kesên bêcîhkirî wê bi giştî tev li pîlankirin û rêvebirina vegera xwe bibin. Ji alîyekî nebûna şefafîyê ya li dora pêvajoyê, pêşî li çavdêrîyê digire, ji alîyê din pir mimkun e ku hilweşandinan bêyî ku pêwîstî hebe, bêcîhkirin ji mercên ku ew pêwîst kirine berfirehtir kiribe.

Astengeke din a vegerê domandina qedexeya derve ye. Her çend qedexeya derve li devereke piçûk hatibe rakirin jî, beşine 14 kuçeyan di 22'ê Gulanê de û hejmareke mezintir a kuçeyên di nav şeş taxan de di 27'ê Tebaxê de; gelek ji deverê piştî daxuyanîya wê bi salekê û neh meh piştî bidawîanîna operasyonên ewlekarîyê, hin jî di bin qedexeya derve de ne. Parêzgerîya Amedê di Gulana 2016'an de ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku piştî ku dever hat sehkirin û ji teqînekan hat paqijkirin, qedexeya derve yê bê rakirin.[87] Rêxistina Efûya Navnetewî dihizire ku bicîhanîna qedexeyên derve yên berfireh û dirêjkirî bi xwe bêrêje bûne û dema ku operasyon didomîyan dibûn cezakirina kolektîv.[88] Bêyî pêwîstî yan operasyonên ewlekarîyê ku qedexeyên derve ji bo wan bûn, ji bo domandina qedexeya derve hêncet kêmtir jî dibe. Neh meh piştî bidawîanîna pevketinên çekdaran li Sûrê, hênceta ku qedexeya derve bidomîne da ku teqînekan ewle bike bi xwe jî bawerîyê nade. Qedexeya derve ya ku nuha didome, nepêwîst xuya dike; ew qedexeya bêcîhkirina kêfî û pêwîstîya ku bi cîh bike ku bêcîhkirin tenê di demên herî kurt ên mimkun de pêk werin, binpê dike.[89] Ji ber nebûna delîlên berbiçav ên rayedaran, xuya dike ku sedema rastî ya domandina qedexeya derve bêtir muhtemel e ku ji bo desteserkirina herêmê û projeya rejenerasyona bajêr e ku ji alîyê rayedaran ve tê meşandin.

Biryara desteserkirina acil ku li gor rayedaran %60'ê tevaya devera navçeya Sûrê dide ber xwe, ji alîyê hikûmetê ve di 21'ê Adarê de kêmî du hefteyan piştî bidawîanîna operasyonên ewlekarîyê, hat dayin.[90] Şaxê Amedê yê Odeya Mîmar û Mihendîsan li gora nirxandina xwe ya pisporî dîyar dike ku li gel fermanên berê

---

82 Hevpeyvîn, Gulan 2016

83 Binêrin, H.Y. û malbata wî rûpel 21

84 Diyarbakır Yenigün, Bîlançoya *10 Mehan: Li Sûrê 1750 Xanî Hatin Hilweşandin,* 19 Cotmeh 2016. Li vir peyde dibe http://diyarbakiryenigun.com/Sûrda-bin-750-ev-yikildi/

85 Agahîya nivîskî ji alîyê Parêzgerîya Amedê ve pêkêşkirî, Hezîran 2016

86 Hevpeyvîn, Gulan and Îlon 2016

87 Hevpeyvîn, Gulan 2016

88 Binêrin, Rêxistina Efûya Navnetewî, *Operasyonên îstîsmarîya qedexeyên derve yên dem nedîyar bi dawî bikin,* 21 Hezîran 2016. Li vir peyde dibe https://www.amnesty.org/en/documents/eur44/3230/2016/en/

89 Prensîp 6 of the Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY. Li vir peyde dibe https://documents-dds-ny.un.org/doc/UNDOC/GEN/G98/104/93/PDF/G9810493.pdf?OpenElement

90 Binêrin, Hürriyet, Desteya Wezîran biryar da ku ji sedî 60'ê Sûrê bi lezgînî were desteserkirin, 25 Adar 2016. Li vir peyde dibe http://www.hurriyet.com.tr/bakanlar-kurulu-Sûrun-yuzde-60i-icin-acele-kamulastirma-karari-aldi-40075526. Biryar wiha dibêje: "Milkên di nav devera rîskê ya li navçeya Sûrê ya parêzgeha Amedê de ku di lîsta pêvekirî de li gora cîh, blok û parselan hatine lîstkirin, wê ji alîyê Wezareta Pîlansazîya Hawirdor û Bajarvanîyê ve bi lezgînî werin desteserkirin; li gora vê kaxeta Wezaretê ya hejmar 2988 û tarîx 16/3/2016, û bi piştdana provîzyon 27 a Qanûna Desteserkirinê, no. 2942, Desteya Wezîran di 21/3/2016 de ev biryar da."

yên desteserkirinê di 2013de, %98'ê navçeya Sûrê nuha hatiye desteserkirin.[91] Biryarê desthilatî da rayedaran ku heft roj di ser pejirandina wê re derbas bibe, erdê desteserkirî bi kar bînin; an ku berî ku avahî werin hilweşandin, rêyeke bitesîr a îtirazê tuneye.[92] Ji malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî hevpeyvîn bi wan re pêk anîne kesekî ji rayedaran li ser biryara desteserkirinê, ku xanîyên wan di nav devera desteserkirinê de ye yan na, yan ku çawa kanin li biryarê îtiraz bikin, agahî nesitendiye. Lêkolîneke li ser navê şaredarîyê pêk hatî, dît ku li gel hewldanên Baroyê yên pêşkêşkirina alîkarîya hiqûqî jî, her çend %95'ê rûniştîyan li dijî fermana desteserkirinê bûn jî, tenê %15'ê wan li biryarê îtiraz kir.[93] Nebûna hewldanên rayedaran ku ji rûniştîyên Sûrê re li ser fermana desteserkirinê agahîyê pêşkêş bikin yan bi wan bişêwirin, li gel dema biryarê ku gava ku rûniştîyên bêcîhkirî hewl dida ku jîyanên xwe ji nuh ve ava bikin pêk hat, hat wê wateyê ku li ser desteserkirinê û encamên wê agahî ji rûniştîyan re nehatiye dayin. Îtirazeke Baroya Amedê, Odeya Mîmar û Mihendîsan û Sazîyên Sivîl li gel Daniştaya dadgeha herî bilind a rêvebirîyê, ku biryara rawestandina bicîhkirina fermana desteserkirinê bide, di ê Tîrmehê de hat redkirin. Dadgeh ê hîn li ser naveroka îtirazê biryarekê bide.

Bi fermana desteserkirinê re têkilîdar, projeyeke transformasyonê heye ku navçeya Sûrê ji nuh ve avadan bike. Pîlaneke şaredarîyê ku deverê ji nuh ve avadan bike ji 2012'an ve heye, berî qedexeya derketina derve û rûxandina milkan di dema pevketinên çekdarî û operasyonê leşkerî de.[94] Rayedarên hikûmeta navendî ku nuha ji bo projeyê berpirsî hilgirtine, hûrgilî neweşandine ku wê piştî qedexeya derve çawa were pêkanîn. Lê belê daxuyanîyên ji medyayê re û bersîvên Parêzgerîya Amedê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re dîyar kiriye ku proje nuha ne tenê parastina mîrata çandî ya deverê, lê her wiha bi avakirina binesazîya ewlehîya polîsî, wê zêdekirina ewlekarîyê jî armanc bike. Ew ê ji nuh ve avakirina hin avahîyên rûniştinê û transferên rûniştîyan bo derveyî navçeyê jî armanc bike.[95] Di gulana 2016'an de, Parêzgerîya Amedê ji Rêxistina Efûya Navnetewî re got ku bêtir hûrgilîyên projeyê û tesîra wê li rûniştîyan wê tavilê werin weşandin. Lê belê, di Mijdara 2016'an de li ser tesîra li rûniştîyan tu hûrgilî nehatibûn weşandin. Hemû malbatên ku Rêxistina Efûya Navnetewî bi wan re hevpeyvîn pêk anîn, dan zanîn ku nivîsgeha komunîkasyonê ya ku rayedaran saz kiriye li ser bijartekên li ber wan an miqdara qerebûya ku wê ji wan re bên pêşniyarkirin, tu agahî nedane wan. Li gel ku bicîhanîna projeyê, domandina hilweşandina xanîyên li ser lingan mayî yên di bin qedexeya derve de jî di nav de, didome, pêvajo bi tevayî bi wê prensîpê re di nakokîyê de ye ku divê rayedar kesên ku di nav welêt de hatine bêcîhkirin bi giştî tev li pîlankirin û rêvebirina vegera wan, ji nuh de bicîhkirin û reîntegrasyona wan bikin.[96]

Ev faktor tev bi hev re jî encameke wiha dîyar dikin ku rûniştîyên Sûrê wê nikanibin wek ku dixwazin vegerin taxên xwe û ku erkeke dewletê heye ku vê yekê saz bike. Ne tenê ew e ku proje bêyî şêwirdarîya bi rûniştîyan hatiye pêşdexistin, lê her wiha projeyên rejenerasyonê yên berê li Tirkîyê, ku projeya Sûrê ji wan bi bingeha xwe ne cuda ye, wiha encam dane ku rûniştîyan nikanîbûne mesrefên xanîyên rejenerasyonê bidana. Armancên dîyarkirî yên projeyê, di sazkirina binesazîyeke mezintir a ewlekarîyê û parastina avahîyên dîrokî li gel transfera rûniştîyan a derveyî navçeyê de, vê encamê nîşan didin. Naveroka nexwestina gelemperî ya rayedaran ku binpêkirinên mafên mirovan bi nav bikin û ji rûniştîyên başûrê rojhilatê Tirkîyê yên li deverên qedexeya derve re qerebûyê pêşkêş bikin jî wê nîşan dide. Ev naverok bi bêtir hewldanên hikûmetê yên bêdengkirina muxalefetê re, ku girtina sazîyên nedewletî yên ku bi mirovên ji Sûrê derxistî re xebat dikirin û alîkarî pêşkêş dikirin jî di nav de ye, xurttir dibe. Îhtîmala ku ev pêşveçûna bûyeran rê bide ku dewlet erka xwe bi cîh bîne ku ji bo vegera malên xwe û devera ku her tim lê rûniştine ji bo rûniştîyên di nav welêt de bêcîhkirî li gel pêşkêşkirina derfetan, şert û mercan saz bike, hema hema nahêle.

[91] http://www.mimarist.org/gundem/4676-mimarlar-odasi-diyarbakir-subesi-Sûr-un-acil-kamulastirmasi.html
[92] Biryarên Desteserkirina Rewşa Acil li gora Xal 27 a Qanûna Desteserkirinê ya 1983an, no. 2942 tên dayin ku dihêlin ku rayedar heft rojan piştî weşandina biryarê milkên desteserkirî bi kar bînin.
[93] Rapora neweşandî ya li ser navê Şaredarîyê pêkhênayî.
[94] Binêrin, Wezareta Pîlansazîya Hawirdor û Bajarvanîyê, Veguherîna Bajarî û Amed. Sibat 2015. Li vir peyde dibe http://www.csb.gov.tr/db/diyarbakir/editordosya/1.pdf
[95] Agahîya nivîskî ji alîyê Parêzgerîya Amedê ve ji Rêxistina Efûya Navnetewî re hatiye dayin, Hezîran 2016
[96] Prensîp 28(2) ji Prensîpên Rêberîya Bêcîhkirina Nav Welêt ên NY dibêje: 'Divê ji bo ku kesên di nav welêt de bêcîhkirî bi giştî tev li plansazî û birêvebirîya vegera xwe yan reîntegrasyona xwe bibin, hewldanên taybetî pêk werin.'

# 6. PÊŞNIYARÊN LI RAYEDARÊN TIRKÎYÊ

- Şert û mercan saz bikin û her wiha derfetan pêşkêş bikin ku kesên di nav welêt de bêcîhkirî kanibin bi dilxwazî, ewlehî û serbilindî vegerin malên xwe, cîhê ku ji kevn ve lê mane, yan jî bi dilxwazî li beşekî din ê welêt bi cîh bibin;

- Qedexeya derketina derve bê derengî rakin û gavan bavêjin ku bi cîh bikin ku heta ku dibe pir rûniştî kanibin yekser vegerin malên xwe, karsazî kanibin çalak bibin û jîyana normal a aborîyê kanibe vegere;

- Heta ku çareserîyên xanîyên mayînde pêk werin, ji ber zirar an domandina qedexeya derketina derve yan jî desteserkirinê, ji bo hemû rûniştîyên ku nikanin di xanîyên xwe de bimînin, alîkarîya adil û têrkir pêşkêş bikin ku pêwîstîyên wan ên sosyo-ekonomîk bersîv bikin; bikin ku xwe bigihînin xizmet û binesazîya têrkir;

  - Teqez bikin ku mekanîzmayek hebe ji bo ku rûniştî li dijî qerebûyên pêşniyarkirî li gel sazîyeke serbixwe îtiraz bikin;

- Hûrgilîyên pêşniyarên ji nuh de avadanîya Sûrê û gavên ku ji bo ku bêcîhkirina rûniştîyan bê derengî bi dawî bînin davêjin tavilê biweşînin; heta ku bi rûniştîyan re şêwirdarîyeke ji dil pêk were ku awayê ji nuh de avadanîyê were dîyarkirin, wê rawestînin;

- Bi tevayî tevlêbûna kesên bêcîhkirî ya plansazî û birêvebirîya veger an ji nuh ve bicîhbûn an reîntegrasyona wan bi cîh bînin;

- Teqez bikin ku hem ji bo xwedî xanîyan hem jî ji bo kirêdaran, piştî qedandina projeya ji nuh de avadanîyê bijarteka vegera navçeyê hebe;

  - Ji bo vê armancê, bi cîh bikin ku ji bo xanîyên li gora budçeyê yên têrkir li gel xizmetên têrkir û binesazîyê, hem ji bo xwedî xanîyan û hem jî ji bo kirêdaran di nav projeyê de tesîs bên pêşkêşkirin;

- Berî ku bêtir pêşde bixin, li ser biryarên desteserkirinê agahîyê bidin rûniştîyan û wan tev li şêwirdarîyeke ji dil a li ser dema bê ya navçeyê bikin;

- Teqez bikin ku ji bo takekesên rûniştî yên ku dibe ku bixwazin li dijî fermanên desteserkirinê îtiraz bikin, alîkarîya hiqûqî ya serbixwe hebe;

- Lêpirsînên hûr û kûr li ser binpêkirinên di dema operasonên ewlekarîyê de qewimîn pêk bînin û bikin ku rûniştîyên ku wek encama tedbîrên birêvebirîyê ku di dema qedexeya derve de û piştî wê hatine bicîhkirin, mafên wan hatine binpêkirin, û ku zirara madî û windayîyên wan ên din pêk hatine, çareserîyên hiqûqî yên bitesîr bi dest bixin.

# RÊXISTINA EFÛYA NAVNETEWÎTEVGEREKE GLOBAL A MAFÊN MIROVAN E. DEMA KU BÊDADÎ LI KESEKÎ DIQEWIME, EW ME TEVAN ELEQEDAR DIKE.

TÊKILÎ BI ME RE

info@amnesty.org

+44 (0)20 7413 5500

TEV LI GOTÛBÊJÊ BIBIN

www.facebook.com/AmnestyGlobal

@AmnestyOnline

# BÊCÎHKIRÎ Û BÊMILKKIRÎ

## MAFÊ RÛNIŞTÎYÊN SÛRÊ YÊ VEGERA MALÊ

Di nav ji alîyê hikûmeta Tirk ve tepisandina dengên muxalefeta Kurdî de, ev rapor balê dede ser bi darê zorê bêcîhkirina rûniştîyên Sûrê li Amedê, bajarê bi nifûsa herî zêde li başûrê rojhilatê Tirkîyê. Li dor 24.000 rûniştîyên Sûrê yên berê, ku hatine bêcîhkirin û malên wan ji wan hatine sitendin, hîn jî nikanin vegerin.

Li gel alîkarîya girîng, lê ne têrkir a rayedaran, gelek malbatên bêcîhkirî nikanîbûne xanîyên alternatîv bi dest bixistina. Mafên din ên wek perwerdeya zarokan jî bi awayekî têrkir rêz ji wan re nehatiye girtin. Her weha, ji ber qedexeyên derve yên domdar, binesazî û malên zirardîtî yan rûxandî yên domdar, mafên kesên bêcîhkirî yên vegerê di xetereke mezin de xuya dike. Rûniştîyên Sûrê di nav bi texmînî nîv milyon mirovên ji başûrê rojhilatê welêt bêcîhkirî de ne, ku ji bo bicîhanîna ewlekarîyê bi guherandina binesazîyê û transferên nifûsê, wek sîyaseteke bêcîhkirina rûniştîyan û hilweşandin û ji nuh de avakirina deverên bajarî xuya dike. Divê hikûmeta Tirkîyê li ser nebûna bikaranîna mafan ji alîyê mirovên bêcîhkirî ve raweste û ji bo ku mirovên di nav welêt de bêcîhkirî bi dilxwazî vegerin malên xwe yan deverên ku lê jîyane, erka xwe ya pêkanîna mercan li gel pêşkêşkirina îmkanan bi cîh bîne.

PÊRIST: EUR 44/5213/2016
ÇILEYÊ PÊŞÎN 2016
ZIMAN: KURDÎ
amnesty.org